

GULEK MIN DÎ

Gulek min dî li zozana û çilmisî stûxwar bû
Gurîne ewr û ezmana bi ser da derd û xembar bû

Li şûna bilbila, lê qûke-qûka kundikê kor bû
Ji xûna dilkula, xêlî li bûka bêcî û war bû

Gulilka tali û bextê welatê min bû ew sorgul
Ji hilma dijmina şextê ku lê da, jariya mar bû

Surr û serma zivistanê, wezî lê bagera zulmê
Ku xûnca war û zozanê me jê çilmisî, lê jar bû

Bihara bilbilê şeyda, ku çû baxê gula hişk bûn
Fizara dilkulê Seyda, ji dil-dara birîndar bû.

Abdurrahman Durre



SEROKÊ DEP'Ê HATIP DICLE DI GIRTÎGEHA NAVENDÎ YA ENQEREYÊ DE PIRSÊN ME BERSIVANDIN:

'NAVÊ SIYASETA DEWLETÊ QETLÎAMA SPÎ YE'



● Di şexsê me de gelê kurd hatiye darizandin û fikrên me yên li ser vî gelî hatine sûcdarkirin. Di şexsiyeta me de, ronakbîrên kurd ku mucadeleya demokrasîyê dimeşînin hatine çavtirsandin.

● Yên ku dixwazin reformên qismî bînin heyatê û bi Ewrûpayê re bibin yek, hem hêza wan qels e û hem jî dengê wan jar e. Hêza wan a siyasî nîn e.

● Di dema dagirkeriya kevn û tarî de jî tu wextê, dagirkeran li ser ziman û çanda xelkekî siyaseteke bi vî awayî zordest nekirine. Xwestiye ku çand û zimanê kurdan bixe gorê.

● Li tevî dinyayê tevgerên azadiyê ji ber xwestina xwe dest neavêtine çekê (silahê). Ji ber ku tu riyên din nemane dest bi têkoşîna çekdarî kirine.

Rûpel 2-3

KURDOLOG MARTIN VON BRUNSEN:

LI NAV KURDÊN TIRKIYÊ VEJÎNEKE NETEWÊYÎ HEYE

- Yanî li nav kurdên Tirkîyê, vejîneke neteweyî heye, şîûra neteweyî şiyar dibe. Ê ku wan dike millet şîûra neteweyî ye. Niha bi awayekî objektîf em lê binêrin çî wan heye?
- Her çiqas li Iraqê ew rewş hebû jî, li Tirkîyê ferqî hebûn, kurd bi navê "Dağ Türk'ü" hesabandin. Kurdên Iraqê jî bi navê "eşqîya" dinasandin.

Rûpel 8-9



Yew film yew sermiyan: Platoon

Novelanê film da "Platoon"î Vietnam di veyreno. Oliver Stone Vietnam di çî diyo, çî ameyo seredê jey û embazan di jey ser, esker a Vietnam di çî bêj qatî-am kerdo, gedey gu-dey seniwa kiştî, cay caragî seniwa veşnay?

Rûpel 13

Tolstoyê gelê kurd: Pîremêrd

Pîremêrd tenê ne helbestvan, rojnamevan û feylesof e jî. Wî her sal bi serê xwe amadeyiya cejna Newrozê dikir, baştir û xweşiktir ew cejn bi gel da naskirin.

Rûpel 12

Portreyê Ehmedê Xanî



Rûpel 16


Exlaq û prensîbên wergerandinê

Di bin navê nemir Qanat de, berpîrsiyarên weşanxaneyan nêrinên xwe anîne ziman û li gorî daxwaz û dilê xwe ew wergerandine. Mirov ecêbmayî dimîne. Sedem çî ye, jî bo çî prensîbên wergerandinê nayêne parastin?

Rûpel 12

SEROKÊ DEP'Ê HATIP DICLE DI GIRTÎGEHA NAVENDÎ YA ENQEREYÊ DE PIRSÊN ME BERSIVANDIN:

'NAVÊ SIYASETA DEWLETÊ QETLÎAMA SPÎ YE'



Hatip Dicle Serokê Partiya Demokrasiyê (DEP) yê dawî bû tevî 5 mebûsên eynî partiya ku ji aliyê dewletê ve hate girtin, di hepsa Navendî ya Enqereyê de ye. Di 8'ê meha Berfanbarê de Dicle, Leyla Zana, Orhan Doğan, Selim Sadak, Ahmet Türk 15 sal, Sedat Yurtdaş 7 sal û nîv, Sırrı Sakık jî 3 sal û nîv ceza standin. Di dema serokatiya xwe de Dicle bi gotinên rasterast ku siyaseta dewletê rexne dikirin û bala dozgerên DGM'ê kişande ser xwe. Siyaseta wî ya zelal û beyanatên wî yên bêtirs, hezkirina gel jî bo wî zêde kir. Lê Dicle alîgirê wê yekê ye ku divê rastî bi temamî bêderew û listikan werin zimên û bi wî şeklê pirsgirêk bêne çareserkirin. Me meraq kir ka di pêvajoya hepiskirinê de rewşa Dicle çawa ye, di dîtinên wî de guherîn çêbûne an na. Em nixandinên gotinên wî yên ku di girtîgehê de ji rojnameya me re anîne ziman jî, ji xwendevanên xwe re dihêlin.

Ji kerema xwe re hûn dikarin li ser rewşa mehkemeya xwe û li ser bûyerên dawî me haydar bikin?

-Derbeya ku di 2'yê adara 94'an de li meclîsa Tirkiyeyê hate kirin, girtina wekîlên gelê Kurd û pişt re bi qerare Mehkemeya Qanûna Bingehîn (Anayasa Mahkemesi) di 16'ê pûşbera 94'an de girtina DEP'ê, derxistina endamên wê bi şekeke bêhiqûqî ji meclîsê, incax dikarin bi emirnameyên MGK'ê bêne îzahkirin. Di roja me de mehkemeya ku cihên Mehkemeyên Îstiklalê digire, Dadgeha Ewlekariya Dewletê (DGM), der heqê me de bi xwestina îdamê dawe vekir. Bi darizandineke (mehkemekirineke) wekî leza jetê, di navbera 4 mehan de cezayên giran (15 sal cezayê hepsê) dîsa dikare bi vî emirnameya jorîn bê îzahkirin. Delîlên ku dozger (sawcî) anî holê tev bi beyanên îtîrafkar û cerdevanan in û tu qîmetên wan ên hiqûqî nîn in. Di gel ve yekê, qet lêkolîna van delîlan jî nehatiye kirin. Ji hêla din ve daxwazên me û yên ebûqatên me red kirin, heqê me yî xwe-parêziyê jî, ji me standin. Kefş e ku dadgeran (hakiman) bi tenê mamûrî kirine û daxwaza MGK'ê pêk anîne. Di şexsê me de gelê kurd hatiye darizandin û fikrên me yên li ser vî gelî hatine sîcdarkirin. Dîsa di şexsiyeta me de ronakbîrên kurd ku mucadeleya demokrasiyê li ser zemîneke legal dimeşînin hatine çavtirsandin û dengê wan hatiye birin.

Gelo di rojên pêş de seyra ve daweyê wê çawa be û hewldanên Ewrûpayê û raya giştî



Hatip Dicle di dema serokatiya xwe de bi rayedarên DEP'ê re tê dîtin.

ya demokrat, wê çi tesîrê bike?

-Yên ku dixwazin reformên qismî binin heyatê û bi Ewrûpayê re bibin yek, hem hêza wan qels e û hem jî dengê wan jar e. Tu tesîra wan li ser standina qerarên Cumhuriyeta Tirkiyeyê yên siyasî nîn e.

Merhaleya duduyan a ve daweya siyasî wê li Mehkemeya Bilind (Yargıtay) dewam bike. Lê tê zanîn ku ew jî li gorî xwestin û polîtîkayên DGM û Daîreya Herba Taybetî biryaran digirin. Di sala 1995'an de qewmînen neteweyî û navneteweyî li ser merhaleya ve daweyê wê li Mehkemeya Bilind tesîrê bikin. An wê li gorî polîtîkaya kevin ev ceza bêne testîqirin, an jî wê vî cezayî li hêviya demê bihêlin (an jî qerare cezadayînê fesh bikin). Heke ku ceza bînen testîqirin emê dozê bibin Dadgeha

Mafên Mirovan a Ewrûpayê û emê Cumhuriyeta Tirkiyeyê li cem raya giştî ya navneteweyî mehkûm bikin. Bi kurtasî doza me neqediya. Wekî nokeke hesinî ye, bêguman wê diranên kesên ku ev dawe vekirine bişikêne.

Hûn projeya "Gundên Navendî" (Merkezî Köyler) ya Tansu Çiller çawa dibînin?

-Bi taybetî, hejmara gundên ku di van çar salên dawî de ji aliyê dewletê ve hatine valakirin gihîştê 2 hezarî. Eger polîtîkaya Sedam a valakirina gundan û derxistina mirovan ji herêman bi bîr were, wê bê zanîn ku çiqas dişibe hev.

Gel, ji gund û bajarên xwe hatine koçberkirin. Ji mecbûrî berê xwe dane bajarên mezin ên wekî Herêma Behraspî (Akdeniz Bölgesi). Ev herêm bi koça gelê kurd hatiye hejan-

din. Polîtîkayên dewletê li vir jî li gorî dilê wê pêk nehatin û lê vegeriyan. Li van metropolan "Getoyên Kurdistan" çêbûne û ev metropol wekî çiyayan li ber teqînê ne. Bi kurtasî gelê kurd di bin serokatiya tevgera azadiyê de hemû hesabên dewleta tirk yeko yeko xera kirine û planên wê serobino kirine.

Ev projeya ku ji aliyê Daîreya Herba taybetî ve hatiye çêkirin û ji aliyê Lijneya Ewlekariya Neteweyî (MGK) ve hatiye tesdîqkirin, derketiye meydana. Di navbera wan û projeya "Gundên Stratejîk" ên ku Amerîkayê li Vietnamê ava kiribûn de, tu ferq nîn e. Li Vietnamê derdorên van "gundên stratejîk" bi tîlan hatibûn pêçandin û hilberîn (îstîsal/ûretim) di destê dewleta dagirker de bû. Çûn û hatin wekî girtîgehê di binê kontrolê de bû. Bi vî a-

wayî dixwestin ku dengê gel qut bikin û tîkiliyên gel û gerîla ji hev biqetînin. Di gel van yekan, dîsa yê ku bi ser ket gelê Vietnamê bû.

Ev rewş, tengasî û bêhêvîtiya dewletê di-de xuyan. Ev hewla nû jî wê tewş be û dîrok wê di leha gelê me yî mezlûm û bêguneh qerara paşin bide.

Der heqê nameya ku Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan, ji serokên dewletên Ewrûpayê û Amerîkayê re şandibû de, hûn çi difikirin?

-Li tevî dinyayê tevgerên azadiyê ji ber xwestina xwe dest neavêtine çekê (silahê). Ji ber ku tu riyên din neman dest bi tîkoşîna çekdarî kirine. Ev tevger her dem aşîxwaz in. Di dîroka tevgerên azadiyê de ev yek li ber çavan e. Şerxwaz her gav dagirker û dijminên gelan in. Yên ku

* ŞERÊ BIRAKUJIYÊ BAŞÛR NASEKINE...



YRWK'ê li Kölnê şaxek ava kir

YRWK di 1995'an de karê çand û hûnerê bi firehî û bilindî dide dewamkirin. Di warê wêje, ziman, dîrok, mûzik, şano, sînema, wênegerî, folklorî û çanda neteweyî de têdikoşe. Di destpêka 1995'an de Konferansa Zimanê Kurdî bi cih anî. Di 15.1.1995'an de li Eyaleta "Bakûra Rain Westwalin" (NRW) 'ê li bajarê Kölnê şaxekê YRWK'ê damezirand. Di civîna vekirina şaxê de gelek biryarên

nû hatin standin. Ji wan biryaran hinek ev in: Panela felsefeyê ya Ehmedê Xanî, "Semînerên çandî, hûnerî û dîrokî, Firehkirina yekî-



tiyê, Çareserkirina pirsgêra perwerdeyê, Di dibistanên almanan û komeleyan de dayina dersên kurdî, Perwerdekariya rêzimanê kurdî, ji bona mamosteyan, Dersên kurdî yên taybetî,

Kampanya xwendina zimanê kurdî...

Endamên YRWK'ê li ser sala nû jî wiha gotin: "Di sala 1995'an de 300 saliya Ehmedê Xanî'ye. Sala çand û hûnera kurd e, sala serkeftina kurd e, sala 95'an sala hemû kurdên dilsoz e. Pêwist e em kurd tekoşîneke wilo bidin ku em karibin layiqî vê salî bibin. Layiqî filozofê mezin Ehmedê Xanî bibin."

Ahmet Baraçkılıç/
Köln

hebûna gelê me înkâr dîkin, bi şerefa gel dilîzin, şer kirine rîyeke bêalternatîf. Siftabûn, ji nava dîrokê rabûn, an jî serî rakirin, liberxwedan û şerkirin... Yên wan rîyan bîzorê datînin ber me tu rîyên demokratîk û aşîxwaz vekirî nehiştine. Vê politikayê dewleta tirk di nava raya navneteweyî de bêkes hiştiye û derxistîye meydanê ku mesûlê vî şerî dewleta tirk e. Derxistina pîrsgirêka kurdî nava raya navneteweyî û geşkirina tîkîliyên diplomatîk, bi vî awayî jî çareserkirina pîrsgirêka kurdî bi terzê aşîxwaz, wezîfeya Hereketa Azadiyê ye. Dem ji bo vî karî zehf musaît e. Lê, fêkiyên karê diplomatîk zehf dereng tî berhevkin. Karê diplomatîk zehf sebr û hostatiyê dixwaze. Zîrveya REHE'yê (AGİK), civîna Konseya Ewrûpayê ya ku di xelasa meha rêbandanê de çêbû û hewayê baş ya li

Parlamentoya Ewrûpayê, ji ber tiştan çalakîyên Lîderê PKK'ê Abdullah Öcalan îmkânên zehf rind amade dîke. Ji ber wext û hewayê navneteweyî ez vî karî li cih dibînim û buhayêke bilind didimê.

Ji bo xwendevanên rojnameyê xerû bi kurdî gotinek we heye?

- Di dema dagirkeriya kevn û tarî de jî tu wextê dagirkeran li ser ziman û çanda xelkê siyaseke bi vî awayî zordest, îmhakar û hov nekirine. Cumhuriyeta Tirk 70 sal e kesayetiya gelê kurd û heyîna gel bi tevayî înkâr kirîye. Xwestiye ku çand û zimanê kurdan bêxe gorê. Navê vî siyaseta yê din qetlîama spî yanê jenosîd e. Hedefa politikayên asimilasyonê her wext zimanê kurdî ye. Kurdî her dem biçûk hatiye dîtin, ronakbîrên kurd ji zimanê xwe hatine dûr derxistin. Keşf e ku di vî meseleyê de zehf texrîbat jî

çêbûye.

Hêj bi serxistina zehf karan heye. Lê Hereketa Azadiyê bi mucadeleyêke jî dil û can, bi xwîna bi hezaran şehîdan asimilasyon daye rawestandin. Di vî merhaleyê de mesûliyeta her mirovê kurd heye ku sazîyên çand û zimanê kurdî ava bikin, alîkariya sazîyên heyî bikin. Hînbûna zimanê kurdî, xeberdana bi kurdî û xwedî lê derketina kurdî dîsa mesûliyeta mirovên kurd e. Rojnameya Welatê Me hewl dide ku di vî warî de karên baş bike, ez vî rojnameya xerû bi kurdî wek qerîna gelê kurd, ya li hemberî vî asimilasyonê dibînim. Ez hêviya bi pêşketina we, tevî hemû xebatkarên rojnameyê di 1995'an de dikim û vî hewldana we pîroz dikim.

Hevpeyvîn:
JÊHAT SERHENG



Xebatkarê Welatê Me Suut Kılıç kete hepsê

Mîdûrê Navenda Nûçeyan yê Welatê Me Suut Kılıç, piştî ku êvara 17'ê meha rêbandanê tevî Gerîndeyê Weşanê Mazhar Günbat û Xwedîya Welatê Me Aynur Bozkurt, kete bin çav ji ber ku cezayê wî hebû hate girtin. Pişt re ew şandin Girtîgeha Bayrampaşayê. Suut Kılıç, di sala 1991'an de beşdarî mehkemeya İsmail Beşikçi bûbû, ji aliyê DGM'ê ve dawe li dijî wî hati-bû vekirin û Salek û 3 meh ceza lê hatibû birîn.

Navên bi kurdî serbest bûn!

Qedexeya li ser navên bi kurdî bi awayekî bêhisûpis hate hilanîn. Li gorî vî yekê, kurd êdî wê bikaribin navên bi kurdî li zarokên xwe bikin. Bi gotineke din Dîlan, Zozan, Çekdar û Egît êdî serbest in.

Ji hêla din ve navê ku ji aliyê idareya nifûsê ve munasîp neyê ditin jî wê jê re cuzdanê huviyetê bê hazirkirin. Wezîriya Karê Hundirîn a Tirkîyeyê ev salek e ku der heqê iptalkirina navan de dawe venekirîye. Bi tenê li gorî Qanûna Nifûsê ya bi navê madeya 16'an malbatan îqaz dikin ku li derveyî kultur, erf û adetên millî nav li zarokên xwe daneynin.

Li gorî van daxuyaniyan, tu astengî û manî li pêşîya danîna navên bi kurdî namîne û malbat bi dilê xwe dikarin navan ji zarokên xwe re hilbijêrin.

Jixwe di van salên dawî de dê û bavên kurd, bi piranî navên bi kurdî li zarokên xwe datanîn. Di gel vî yekê, tê diyarkirin ku dewletê jî ber muca-deleya malbatan di vî warî de mil daniye.

Li metropolan jî mal tîne şewitandin

Li Edeneyê li taxa 19 Mayıs'ê mala endamê HADEP'ê Kazım Tepe roja 16'ê rêbandanê ji aliyê hêzên tarî ve hate şewitandin. Li gorî agahiyên ku cîranên Kazım Tepe dan, ev mal ji aliyê polîsan ve hatiye şewitandin. Cîranên Kazım Tepe dan zanîn ku berî bûyerê polîsan avêtine ser vî malê, lê kes mal tune bûye û tiştên di malê de şikêndine. Cîranan got ku wan dîtiye bi şev polîsên sivil bi erebeyeke spî, pêşî hatine ev mal kontrol kirine û bi dizî agir berî malê dane.

Di sa hate gotin ku Kazım Tepe tevî malbata xwe jî ber polîsan xwe veşartîye. Bavê Kazım Tepe, Mehmet Tepe jî got ku lawê wî wan rojên dawî ji aliyê polîsan dihat tehdîtirin.

Serokê HADEP'a Edeneyê A.Samet Yaman li ser vî bûyerê ev daxuyanî kir: "Divê kurd pirtir bi rêxistinî bibin, nexwe vî pirtir zehmet bikişînin, ji ber ku ji Edeneyê wê de nikaribin birevin, ji ber ku behr heye." Samet Yaman got ku li ber kurdan yek rê mayê ew jî li berxwedan e.

Gotinên rayedarên dewletê ji hev dûr in!



Serokkomarê Tirkiyeyê Süleyman Demirel

Beyanetên rayedarên dewleta tirk ku ew li ser şer didin ji li hev nakin. Dema mirov reqemên sê çavkaniyên dewlet; Rêveberiya Taybet, Wezîriya Karê Hundirîn û Serokomariyê dide ber hev, dibîne ku ferqeke berbiçav di navbera wan de heye. Reqemên ku ev sê sazîyên dewletê ji bo 10 mehên pêşin yên 1994'an didin di tabloyê de têt dîtin

Rêveberiya Taybet hejmara hêzên ewleyî ku hatine kuştin wekî 248, Wezîriya Karê Hundirîn wekî 1089 û Serokkomariyê jî vê hejmarê wek 919 destnîşan dike. Dîsa hejmara gerîlayên ku di şer de hatine kuştin, li gorî Ünal Erkan 3905, li gorî Nahit Mentеше 4060 û li gorî Süleyman Demirel 3709 kes in. Lê pîrbûna hejmara bûyera îdiayên dawîlêanîne pûç derdixe.

Ji bilî vê yekê têt zanîn ku dewlet hejmara zayiyatên xwe kêr, yên PKK'ê zêde nîşan dide. Pir caran jî cerdevanên ku di şer de mirine yan wekî gerîla an jî wekî kesên sivil têt binavkirin. Li aliyê din hemû mi-

rovên sivil yên ku ji aliyê hêzên dewletê ve têt kuştin dibin gerîla. Lewre hejmara gerîlayên ku hatine kuştin digîhêje 4 hezarî.

Li gorî lêpîrsîneke ku roja 17'ê rêbendanê di rojnameya Turkish Daily News'ê de derket, Weqfa Mehmetçik ji sala 1982'yan bi vir ve alîkarî daye 7347 malbatên kesên ku di şer de mirine, Weqfa Polis jî heta niha alîkarî daye hezar malbatî. Ev jî der heqê rastbûna reqemên wan sazîyan ên li ser zayiyatên hêzên ewleyî fikrekê dide mirov.

Navenda Nûçeyan

Reqemên Rêveberiya Taybet

Hejmara bûyera	-
Gerîlayên ku hatine kuştin	3905
Gerîlayên ku birîndar bûne	-
Milîtanên hatine girtin/ teslîm bûne	390/367
Hêzên dewletê yên hatine kuştin	248
Ën birîndarbûnê	-
Kesên sivil ên hatin kuştin	908
Ën birîndar	1037
Kesên bi navê PKK'ê ketine binçav	10314

Reqemên Wezîriya Karê Hundirîn

Hejmara bûyera	3116
Gerîlayên ku hatine kuştin	4060
Gerîlayên ku birîndar bûne	149
Milîtanên hatine girtin/ teslîm bûne	11852
Hêzên dewletê yên hatine kuştin	1089
Ën birîndarbûnê	2586
Kesên sivil ên hatin kuştin	1062
Ën birîndar	1775
Kesên bi navê PKK'ê ketine binçav	-

Reqemên Serokkomariyê

Hejmara bûyera	475
Gerîlayên ku hatine kuştin	3709
Gerîlayên ku birîndar bûne	49
Milîtanên hatine girtin/ teslîm bûne	485/317
Hêzên dewletê yên hatine kuştin	919
Ën birîndarbûnê	2119
Kesên sivil ên hatin kuştin	814
Ën birîndar	1037
Kesên bi navê PKK'ê ketine binçav	10314

Navên 10 kesên ku di xaçpîrsa hejmara 8'an de peyva veşarî 'Îhsan Nûrî Paşa' dîtine û xelat qezenc kirine.

Mizgin Kadıköy

Eyyüp Demir Ankara

M. Ali Mutlu Malatya

Mehmet Ülgen Adıyaman

Yakup Başboğa Kızıltepe/Mardin

Mazlum Özgür K.Kale/Izmir

Celil Akdoğan Diyarbakir

Abduselam Alkış Adana

Ilo Nepere Istanbul

Ferhat Can Siirt

Xaçpîrsa me bixelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, em dinirxînin. Xelat bi usûla qurayê li deh kesan têt belavkirin. Xelata vê heftiyê pirtûka **Abdurrahman Durre "Evîna Welat"** e.

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçpîrsê binivîsînin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.

Xelata Xaçpîrsê



"Evîna Welat" Abdurrahman Durre

X A Ç E P I R S A B I X E L A T

Di wênayê de têt dîtin Ajneberî Soberî	Jîna ku teşiyê dirêse Pereyê Bûlgarîstanê	Notayek Paşgîrek	Galerî Zarîf	
Cemed			Cihê ku genim lê dibe ard	
Navek			Yezdanekî Misrî	5
			Lat	
Dînbûyî		Navek Beşek ji bedena mirov		Tê cûtin
Qet, hiç				Bi aqil, zîrek
	Ardû			Xwendina tîpekê
	Menzel			Derew
Çiçekek			Eşq	4
Împaratorê kurd				
		Ji qeselê çêdibe	Pirça mîşînan	2
		Çiya	Di notayê de sekinok	
Hejmarek				7
Rojek		Notayek	Rengêk	
	Dîn		Kûçik	Kurtenivîsa Komara Tirkiyeyê

PEYVA VEŞARÎ



AGAHIYÊN ABONETIYÊ

Min Welatê Me divê

<input type="checkbox"/> 3 Meh	<input type="checkbox"/> Li Hundir 400.000 TL	<input type="checkbox"/> Li Derve 30 DM
<input type="checkbox"/> 6 Meh	<input type="checkbox"/> 800.000 TL	<input type="checkbox"/> 60 DM
<input type="checkbox"/> 12 Meh	<input type="checkbox"/> 1.600.000 TL	<input type="checkbox"/> 120 DM

Bedelê Abonetiyê ez radizînim

Li Tirkiyê - Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Hesap No: 1100264-1

Li Derve - Roza Basın ve Yayın. San.Tic.Ltd.Şti. Yapı-Kredi Parmakkapı Şubesi Döviz Tevdiat Hesap No: 3001507-3

NAV Û PAŞNAV :
NAVNÎŞAN :

Navnîşana Welatê Me

Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu/ İST.
Tel-Fax: 2491344 - 245 29 91

LI NÎJERYA BI KIRINËN RÊVEBERIYA LEŞKERÎ;

MAFËN MIROVAN KETIN BIN PIYAN

Li Nijeryayê Serokê Rêveberiya Leşkerî Sani Apachi, di 12'yê tîrmeha 1993'yan de hilbjartin li dar xist. Piştî ku dît wê bi ser nekeve ew îptal kir. Li gorî çavdêriyan ku Serokê Muxalefetê Moshood Abiola bi serketibû.

Greenpeace'ê û rêxistinên hawirparêz (çevreci) kirina rêveberiya leşkerî û şirketa neftê Shell Oil protesto kirin. Van rêxistinên da zanîn ku binpêkirina mafê mirovan û xerakirina xwezayê ji aliyê serokê Rêveberiya Leşkerî Sani Apachi ve tê plankirin. Li Herêma Ogoniland ku li başûrê Nijeryayê dikeve Çalakdarekî (aktîvîst) Hawirparêz bi navê Ken Saro-Wiwa ji ber ku li hemberî faalîyetên Shell Oil'ê derdiket ji aliyê cuntayê ve di meha gulanê de hate girtin, hêzên hawirparêz girtina wî jî protesto kirin.

Di navbera mehên gulan û tîrmeha 1994'an de hikûmeta Apachi leşker şandibû vê herêmê ku cihê sereke yê neftê ye. Artêşê êrîş biribû ser 30 bajar û gundên vê herêmê gelek mirovên wan deran kuştibûn, zilmeke mezin li gel kiribû. Li gorî



Li jor Serokê Rêveberiya Leşkerî yê Sani Apachi, li kêlekê jî parêzerê navdar ê mafên mirovan Gani Fawehimini tên dîtin.

rapora Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî di 1994'an de tenê li vê herêmê 50 kes hatiye kuştin, 600 kes jî hatiye girtin. Lê ne tenê li vê herêmê li seranserê vî Nijeryayê tê kirin.

Li Nijeryayê Serokê Rêveberiya Leşkerî Sani Apachi, di 12'yê tîrmeha 1993'yan de hilbjartin li dar xist. Piştî ku dît wê bi ser nekeve ew

îptal kir. Li gorî çavdêriyan ku Serokê Muxalefetê Moshood Abiola bi serketibû. Piştî ku hilbjartin hate îptalkirin rêxistinên demokrasîxwaz dengê xwe bilind dikan, karkerên sektora sereke neftê dikevin grevê ji bo encama hilbjartinê bê pejirandin û Abiola ji bibe serokkomar.

General Apachi di



meha gelawêjê de hinek qanûnên taybet derxistin, li wan qanûnan biryara Apachi di ser her tiştî re ye. Bi vê politikaya tundraw, Serokê Koalîsyona Demokratîka Neteweyî Abiola û serokên sendikayên di grevê de Kongreya Keda Nijeryayê (NLC) û NUPENG'ê jî tê de gelek mirovên demokrat, mafparêz hatin girtin. sê rojnameyên sereke jî

tê de 15 weşan hatin dadan. Êrîşên li hemberî kesên ku demokrat gurtir bûn. Kesên navdar ku li dijî vê politikayê derdikevin, yên wekî Profesor Wole Soyinka ku xwediyê Xelata Nobelê ye û Parêzerê navdar Gani Fawehimini zilmê dibînin, tên girtin, tên kuştin.

Nûçeyên Derve



Li Japonyayê erdhej


Roja 17'ê mehê li bajarê Kobê erd hejiya. Li gorî agahiyan şideta wê hejekê (zelzeleyê) li gorî pîvana richter 7.2 ye. Di vê bûyerê de di gel zirareke mezin a madî bi kêmasî 3 hezar kes mirin, nêzikî 15 hezar kes jî birîndar bûn. Gelek mirov jî winda ne, jê tê tirsîn ku hêjmara miriyan zêde bibe.

Li Meksikayê hevditinên aştîyê

Nûnerê hikûmeta nû ya Meksikayê Wezîrê Karê Hundirîn Esteban Moctezuma û Komutanê EZLN'ê Marcos li Daristana Lacandon ku di bin konrola gerilayan de ji bo aştîyê hev dîtin. Moctezuma da zanîn ku ev hevditina 16'ê rêbendanê bi awayekî baş derbas bûye û bûye sedem ku tîkiliyên her du aliyên germ bibin.

Li Rusya Zhironovsky dibê berendamê serokkomariyê

Li gorî nûçeyêke Iter Tass'ê ku roja 16'ê mehê weşand, Serokê Partiya Liberal Demokrat Vladimir Zhironovsky wê ji bo serokkomariyê bibe berendam. Tê hêvîkirin ku li Rusyayê di sala 1996'an de ji bo serokatîyê hilbjartin çêbibe. Partiya Liberal Demokrat bi dîtinên xwe yên netewekar tê nasîn.



DI JIYANA KURDÊN ÊZÎDÎ DE NÊRÎNEKE BILEZ LI SER EDEBIYAT Û MUZÎKA KEVNEŞOPÎ

XEWA BERÊ SIBÊ ZOR EZAB E!

Bi vê melodiya ku bi sedan salan ew çiya, gelî û asêgehên Kurdistanê bi hev re bûne hogir, roj gewrayiya sibê hembêz dike. Nifş bi nifş, ji bavpîran gihîştîye neviyên neviyan. Lê mixabin ku bûye hêsira dilgirtiyên xwe çiya û asêgehên Kurdistanê.



Bi beyanê re, herî ku roj bizeriqe, dengê def û şebabê bi ser yê dîkan dikeve. Awazekî dilveker û bêmirin, di wan geliyên kûr de, li hev zîz dibe. Pê re dengêkî qebe, zelal û xweş pêl dide:

Cindiyo rabe roj e
Bes vê xewê hindoje
Xewa berê sibê zor edab
û doj e

Cindiyo rabe rabe
Bes vê xewê tu şa be
Xewa berê sibê zor ezab e

Bi vê melodiya ku bi sedan salan ew çiya, gelî û asêgehên Kurdistanê bi hev re bûne hogir, roj gewrayiya sibê hembêz dike. Nifş bi nifş, ji bavpîran gihîştîye neviyên neviyan. Lê mixabin ku bûye hêsira dilgirtiyên xwe çiya û asêgehên Kurdistanê. Neketiye ber pozên pênûsan û rûdemên rûpelan nedîtiye. Kevnetoreyekî nenivîsin bi devkî dûrbûna sedan salan qut kiriye, di germiya dilan de, di rekeha sîngan de xwe veşartîye û gihîştîye vê demê. Ev kevnetore qewl, beyt, lavij û dûayê êzîdiyan in. Edebiyateke neçapkirî û

belawela ye. Lê béguman zengîniyeke bêhempa ye di edebiyata kurdî de. Lehiyeke ji nîrxên edebî yên neteweyî, pêdiviya wê bi xebat û kedê heye da ku bibe guleke geş di gulistana Kurdistanê de.

Belkî pêwist bû ku em li ser êzîdî û êzîdîtiyê rawestin. Bîr û bawerî, dîtin û raman, hozananî û mîtolojiyên wan di berçav re derbas bikin. Lê bi rastî, me nikaribû xwe li ber vê pêla edebî bigirin, lewre me ji vir dest pê kir. Dibe ku di bin siya van besteyên dînî de, em çar çaran destê xwe dirêjî şîrovekirina bîr û baweriyên ji, bikin.

Em dikarin kevnetoreyê êzîdiyan yê dînî dibin sêwan-ka çend beşan de, parve bikin:

1. Dûa (nimêj): Hêvî û

lûlûbê li ber Xwedê dikin. Pesnê wî, melayîketên wî û xas û çakên wî didin. Ev dia dibin du beş:

a. Diayên bingehîn û pêwist ên ku her roj tîn kirin, ew jî, ev in:

- Dûayê piştgirêdanê
- Dûayê fecrê (berbangê)
- Dûayê sibehê
- Dûayê nîvro
- Dûayê êvarê
- Şehdebûna dînî
- Dûayê Tawûsî Melek.

b. Dûayên ku di rewş, dem û cihên taybetî de tîn kirin. Ji van dia ev in:

- Dûayê biskê
- Dûayê sifrê
- Dûayê êşa memikê jinan
- Dûayêêşa diranan
- Dûayê kêma heyvê
- Dûayê zerikê

- Dûayê nezerê
- Dûayê zikêşê
- Dûayê stêra dembilqapê (sibehê)

- Dûayê oxirê
- Dûayê dûpişkê
- Dûayê girêdana devê gur
- Dûayê birina gêrikan
- Dûayê temamiya Şêx Adî
- Dûayê mehrbirinê
- Dûayê ewiqandina mîzê.

2. Qewl û beyt: Mîna helbestan in. Pesnê Xwedê û heft melayîketên wî û qenc û xasên wî didin. Ev qewl, pîr in û dirêj in, piraniya wan jî, bi def û şebabê tîn gotinê û li ber wan semaya dînî digerin. Qewl û beyt di demên taybetî de tîn gotin. Gelek qewl hene, em navên çendekan rêz dikin:

- Qewlê Tawûsî Melek
- Qewlê Zebûnî Meksûr
- Qewlê Afirîna dinyayê
- Beyta Cindî
- Qewlê şûrê rastiye
- Qewlê Hesedê Altewrî
- Qewlê qiyametê
- Qewlê Miskîno Jaro.
- Qewlê Şêx Adî û mêran
- Qewlê Pîr Dawûd
- Qewlê Gêla çar ziman
- Qewlê Melik Şêx Hesên
- Qewlê Şêx Şemsê Tewrêzî
- Qewlê Helacê Mensûr
- Qewlê Pîr Şeref
- Qewlê Derwêşê Adem
- Qewlê Mîr Brahîmê

Adem
û gelek qewl û beytên din.

3. Stran û lavij: Gernasî, siwarî, çakî û dildariyê tînin zimên. Hejmareke bêdawî

cihê xwe di nava vî beşî de digirin. Stran û lavijên herî binavûdeng di nava Êzîdiyan de, ev in:

- Êzdî Mîrza
- Derwêşê Evdî
- Lavijê Pîrê
- Şerê Brahîm Paşa
- Memo û Zîn
- Şêx Kalo û Edûla Mistefa

Begê

- Êma Hemo
- Siyabend û Xecê
- Şerê Simko Axa

4. Dîlo: Ev stranên şîne ne. Jin li ser miriyan dibêjin. Bi dengêkî melûl û kovan û awazekî girinî, başî, çakî, mîrxasî û delaliya mirî tînin zimên.

5. Beste: Awazên sivik ên dîlanê ne. Di govend û dîlanan de û li ber kar û paleyîyê tîn gotin.

- 6. Gotinên pêşyan
- 7. Serpêhatî
- 8. Çîrok û efsane.

Çavkanî:

- Êzîdîtayî Xidir Silêman û Xelîl Cindî
- Ber bi zanîna rastiya Êzîdîtayîyê ve, Dr. Xelîl Cindî
- Kovara Laliş, hejmar 1
- Zargotîna Kurdan, Celîlê Celîl û Ordîxanê Celîl
- Nivêjên Êzîdiyan, Pirtûkxaneya Hawar, C. Bedirxan
- Celwa Şêx Derwêş- Dûa û dirûzên êzîdiyan, Derwêş Heso


SELÎM BIÇÛK



Gelek Êzîdiyên kurd hê jî bi kincên xwe yên kevneşopî dijîn. Li kêlekê Mele Abdurrahman Durre di nav kurdên Êzîdî de tê dîtin.

N

ivîskar, sosyolog û Kurdolog Martin Von Brunsen nêzî 30 salî ye, kurdan nas dike û li ser wan lêkolînê dike. Li ser civaka kurdan, li ser jiyana wan a kevneşopî lêkolînên xwe, di nava du pirtûkan de civandine: Pirtûka wî ya herî tê naskirin "Axa, Şêx û Dewlet" e. Nivîsên li ser Kurdistanê û Di Seyehatnameya Ewliya Çelebî de Diyarbekir pirtûkên wî yên din in. Brunsen, bi mehan jî li nava kurdan jiya ye, ji ber vê yekê ew bi zaravê soranî baş xeber dide û bi zaravayê kurmançî jî kare derdê xwe vebêje.



Wêne: R.M.A.O.

KURDOLOG-NIVÎSKAR MARTIN VON BRUNSEN LI ALMANYAYÊ BI MUXABÎRÊ ME FAYSAL DAĞLI RE XEBER DA:

'TIŞTÊ KU KURDAN DIKE MILET HIŞÊ NETEWÊYÎ YE'

Birêz Brunsen têkilatiya we û kurdan bi çi awayî çêbû, hûn mirovekî ji Holandayê û kurd li rojhilatê, we çawa hev û din nas kir?

- Belê, ez ji sala 1966'an vir de diçim Rojhilata Navîn. Ez heta wê salê jî li ser matematîk û fizîkê dixebitîm. Di çûndinên rojhilatê de min di sala 1966'an de li Bexdayê çend kurd nas kirin. Wan ji min re qala xebata kurdan a neteweyî û qala dîroka wan kir. Û meraka min li ser kurdan çêbû. Jiyana û dîroka wan bala min kişand. Min piştî vê dev ji matematîk û fizîkê berda, dest bi antropolojî û sosyolojiyê kir. Min xwest li ser jiyana wan a kevneşopî, jiyana civakî û

têkiliyên nava eşîr û kurmançên wan bisekinim. Di jiyana wan de rolên şêx û axayan a herî girîng bû.

Berî gera rojhilatê, li ser kurdan we tiştek nebihîstibû?

- Bes di hinek pirtûkan de ez rastî wan hatibûm. Wekî pirtûka Karl May, ku navê wê "Li Kurdistanê Hov" e. May nivîskarekî Alman e. Û wekî wî...

We projeya xwe çawa dom kir?

- Di sala 74'an de wekî min got, bûrs dan min. Û min berê xwe da Kurdistanê Îranê. Ez şêx mehan li Kurdistanê Îranê li nava kurdên Mehabad, Saqiz, Senandaj û Banê geriyam. Ji

vir çûm Xoresanê. Li vir jî hinek civakên kurdan hebûn. Eşîrên wan ên mezin li vir Çemişgezek in. Ew di wexta Sefera Şah Ebbas de hatine vir. Bes ew kurdên Şîî bûn.

Têkilatiya wan û Çemişgezekê Dêrsimê nîn e...

- Na nîn e. Yê Xoresanê zaravayên wan ne dimilî ye, ew bi kurmançî xeber didin. Li Dêrsimê, di Pertek û Çemişgezekê de çend eşîrên bi kurmançî xeber didin hene, lê ew nû çûne vir. Li Dêrsimê eşîra Şadilî heye. Kemal Burkay jî, ji vê eşîrê ye. Ev jî bi kurmançî xeber didin. Hinek ji wan li Kurdistanê Îranê hene. Li wir navên wan Şadî ye, lê eynî eşîr e. Ez li nava

kurdên vir, yanî mintiqeya Kuçan, Sîrwan û Becnût qasî mehekê mam.

Paşê...

- Paşê min berê xwe da Kurdistanê Îraqê. Wê çaxê ku ez gihîştim Başûr, kurdan, (Mele Mistefa Berzanî) şer dikir. Di destê wan de mintiqeya xelaskirî hebû. Ez çend hefte li nav wan de geriyam. Min baş bi soranî dizanibû. Lê Savakê(*) ez girtim. Wan fêhm kir ku ez biyanî me.

Û hûn derveyî tixûb kirin?

- Ez derxistim derveyî bajêr û ez şandim Tehranê. Şahê Îranê jî ber ku dostê dewletên Ewropa bû ew li hemberî biyaniyan nazîk bûn!

Ez ji wir jî çûm Tirkiyeyê. Wê demê zû bi zû nikaribûn min derveyî tixûb bikin. Li Tirkiyê jî wisa bû. MÎT(*) tu bigirtana derveyî wilayetê dikir. Rêdana wan di tixûbê wilayetan de bû.

Ew ji bo biyaniyên ku diçin Kurdistanê baş bû?

-Belê. Heta wê demê computer jî nîn bû. Li gorî min wan salan ji bo kurdê Tirkiyeyê û ji bo gelên tirk ji her demî zêdetir azadî hebû. Gerîla nîn bû. Vejîna neteweyî nû dest pê kiribû. Û heta salên 60'î jî ketina biyaniyan ya li Kurdistanê qedexe bû. Jixwe dewleta tirk jî bûbû du şeqan. Aligirên Ecevit û aligirên Milli Cepheyê, dewlet kiribûn du

perçe. Polis û MÎT jî du perçe bûn. Ji bo vê yekê li ser Kurdistanê nikaribûn dadgeriyê tam pêk binin. Ev rewş jî, ji bo me biyaniyan istifadeyekî baş bû. Ez bi rehetî karibûm bigeriyama.

Li nava kurdên bakur hûn çiqasî geriyan?

- Ez bi navê tûrist li wir bûm. Wê demê tûristekî dikaribû sê mehan li Tirkiyê bimîne. Ez jî piştî sê mehan çûm Kurdistanê Sûrî. Û cardin ve geriyam nava kurdên Tirkiyeyê. Li vir ez li hemû deveran geriyam. Li gundekî, li bajarêkî çend rojan disekinim. Jixwe ez nikaribûm li cihekî pir bimama.

We ev tiştên diditîn û çavdêrî dikirin, ji bo

pirtûkeke hazir dikir?

- Belê. Ez heta sala 1983'yan her dem diçûm Kurdistanê. Piştî wî min dest bi xebata li ser îndonezya kir. Min nikaribû her sal ji Îndonezya herim Kurdistanê. Di salên 74 û 76'an de min lêkolîn dikir, lê salên din ez tenê digeryam. Lê dîsa ji min piştî sala 85'an dest bi çûndina Kurdistanê kir. Di salên 86, 89, 91, 92'an de ez çûm Kurdistanê.

We rewşa kurdan a siyasî jî taqîb dikir, an jî li gorî we, di nava wan salan de rewşa wan a siyasî çawa guherî?

- Di 76'an de ji bo lêkolînê ku ez hinek serbest bûm, ez ji rêxistinên rêzanî bi zaneyî dûr mam. Min ew çax nedixwest bala polîsan bikişînim. Jixwe piştî wê dîrokê kovarên wek Rizgarî, Özgürlük Yolu derketin. Min ew dixwendin. Yanê min dest bi taqîpkirina dîroka siyasî jî kir.

Wê demê li Ewrûpayê kurdên siyasî tune bûn, yê ku we ew nas dikirin?

- Piştî 78'an hinek mirovên ku têkilatiya wan bi rêxistinên re hebû, hatin Ewrûpayê, hin ji van karker bûn, hin ji wan xwendevan bûn. Ji

hinek rêxistinên bi taybetî ji bo karên rêzanî hinek mirov hebûn û bi wan re têkiliyê min dest pê kirin.

Hûn pêşeroja kurdan çawa dibînin? Li Tirkîye hatine heta wê kozîkê, li Iraqê rewşa wan hatiye guhertin, wê kurd çawa bikin, hûn çi difikirin?

- Dewleta tirk ev meseleya dereng fêm kir. Di salên 70'yan de hinek mafên çandî bidana, wê îro rewş ne wiha bûya. Lê mixabin, wê demê navê kurdan jî nexwestin bibihîzin. Heta sala 90'î jî dixwestin navên kurd û hebûna wan jî holê rakin.

Di sala 70'yan de kurdên Iraqê bi mafên çandî bûn, lê wê mafan pirsê kurdî çareser nekir...

- Her çiqas li Iraqê ew rewş hebû jî, li Tirkîyeyê ferqî hebûn, kurd bi navê "Dağ Türk'ü" hesibandin. Kurdên Iraqê jî bi navê "eşqiya" dinasandin, li gorî dewletê têkilatiya wan û kurdên Tirkîyeyê bi hev re nîn bû.

Baş e, niha di wê demê de pirsgerêka wan çi ye?

- Pirsgerêka kurdan bi min ne objektîv e. Ev pirsgerêka di dilê kur-

dan de heye. Di raperîna gelên kurd û dewleta Iraq, İran, Sûrî û Tirk de ye. Niha dayîna mafên çandî ne bes e. Di salên 60'î de li Kurdistanê "Doğu Mitingleri" hebûn. Wan tenê digotin "Em kurd in" û hinek daxwazên aborî, îslahatên îktisadî dikirin. Tenê digotin "Em dixwazin bi zimanê xwe xeber bidin û bi navê kurd di nava tixûbên Tirkîyeyê de bijîn", tenê ev. Di salên dawî de jî ev daxwaz guherîbûn, xortên kurd klasîkên marksîstî xwendin, pirsê neteweyî, li gorî vî îdeolojiyê çawa tê bikaranîn ew fêm kirin. Û qala tayinkirina qedera miletan kirin, ev di salên berê de qet tunebû. Paşê behsa Kurdistanê serbixwe kirin. Di dawîya salên 70'yî de dîtîna ku ji bo wê daxwazê tenê karên siyasî têrî nake, dest bi şerên çekdarî jî kirin. Darbe hat û ewên ku li karê siyasî dixebitîn, hatin kuştin, girtin û revandin, li sehneyê tenê rêxistînek ma. Û ev îro jî ji dewletê talebên herî mezin dikin, ji van ya herî asgarî, otonomî ye. Serxwebûn belkî di serê wan de heye. Lê di pratîkê de nikarin jiyane bidin wê fikrê. Û Apo jî di nav de, serokatiya kurd vî tiştî zanin. Belê, ihtimal e ku tixûb jî bi-

guherin, lê niha ne Amerîka û ne jî Rûsya dixwaze li Rojhilatê guherîneke wisa çêbibe. Helbûna pirsê incax di çarçoveya Tirkîyeyê de bibe. Lê wê kurd çi bixwazin ew jî pir ne kifş e.

Ji bo kurdan yekbûn û serxwebûn ne mafek e, ne tiştêk tabî ye?

- Maf çi ye, çi tabî ye, ez nizanim. Ez ne kurd im, ne tirk im. Ez nabêjim mafê te ye. Ji ber ku maf tiştêkî razber (soyut) e. Di lîteraturê de behsa "mafên miletan, tayinkirina qedera wan" dibe. Lê dema em mêze dikin, dertê holê ku kî, bi çi armancê jî vî tiştî behs dike.

Mirov di paceya dadê (edaletê) re li meseleyê binêre...

- Di beyannameya Neteweyên Yekbûyî (NY) de behsa tayinkirina qedera miletan dike. Bes di wê de mîlet çi ye, ne vekiriye. Di pratîkê de em dinêrin, ê ku li gorî wan "mîlet" in, koloniyên rojhilatê yên kevn in. Wek Cezayîr û Kongo... Keza Cezayîr û Kongo dewletên pîr mîlet in. Dîsa NY bi navê xwe carekê ne rast e. Ne Neteweyên Yekbûyî ne. Ew dema dibêjin "mîlet", behsa "dewlet"ê dikin.

Kurd miletek e, nete-

weyek e, ev dîtin şiroveyek e. Mesela Alman 50 sal parçebûn. Bûn wekî du neteweyên cuda. Zimanê wan yek bû, lê serê wan, fikrên wan jî hev cuda bûn. Em vî tiştî bidim berçav, gotina ku "Kurd neteweyek in" bi zanistî min tesbît nekiriye ku kurd neteweyek in an na.

Alman jî ne neteweyek in?

- Xwediyê dewletekê ne.

Der heqê Îngilîzan de fikrên we hene, ku ew ne neteweyek in?

- Ji kê re dibêjin Îngilîz? Sqotlandî Îngilîz in? Ez Îngilîtereyê zanim, lê bi zanistî, neteweya Îngilîz li ku dest pê dike, li ku diqede ez wê nizanim. Belê, ji aliyekî ve, gelên Îngilîtereyê miletek e, lewre çand yek e. Sqot her çiqas bi zimanekî xeber didin jî, xwe neteweyî din dihesibînin. Di fikir de cuda ne. Îrlanda jî wisa.

Em dîsa werin ser kurdan?

- Kurdek ji xwe re bibêje "ez tirk im" ew tirk e. Nexwaze bibe tirk, bibêje ez kurd im, ew kurd e. Ji ber wê yekê pîr kes hene ku niha bûne kurd. Ji berê ve, famîlyê wan kurd bûne û asimîle bûne, lê niha ew

bi kurdî jî nizanin lê dibêjin em kurd in, mirovên wisa pîr in, tu jî wan pîr nas dikî. Yanî li nav kurdên Tirkîyeyê, vejînek neteweyî heye, şûra neteweyî şiyar dibe. Ê ku wan dike mîlet ew e, şûra neteweyî. Niha bi awayekî objektîf em lê binêrin çi yê wan heye? Jiyanê aborî, serbixwe nîn e. Herêmekî wanê pîr kifş û cuda nema. Ez ji hinek hevalên xwe yê tirk re dibêjim, 15-20 sal şûn ve hûnê li nav Enedolê, herêmeke otonom bixwazin, tirkîstanek otonom hûnê bixwazin, lewre hemû qerexên behra bûne Kurdistan. Niha li Kurdistanê çiqas kurd hene? Ji sedî 40-50, belbî hindiktir jî! Tiştê ku neteweyekî teşkil dike welat e. Ew xeyalî be jî, rastî be jî wisa ye.

Belê, lê ev dîrketina axa wan ne ji ber daxwazê tabî ye, ji ber zixtên siyasî û jenosîdî ev rewş hatiye holê... Û bi hêviya me ev dîrketin demdemî ye (muwaqet)...

- Ne demdemî ye. Tu yê bifetîlî Kurdistanê?

Belê, ezê bifetîlim.

- Tu yê çi şûxilî bikî li Kurdistanê?


Ez birçî jî bimînim ezê bifetîlim, ez dixwazim bifetîlim. Û pîrî kurdan jî wê bifetîlin welatê xwe.

- Tu yê bixwazî, lê tu nafetîlî.

Ez bawer dikim, roja ku îmkana fetilandinê derê, wê pîr kurd bifetîlin. Bes ji bo kurdên Ewrûpa mirov nikare tiştêkî bibêje, lê wanê ku pîranî li Tirkîyeyê belav bûne, wê herin ser axa xwe. Li Başûrê Kurdistanê jî wisa bû, di penaberiyê de pîr ji wan fetîlin.

- Her çiqas bifetîlin jî, wê li axa Kurdistanê kêmayetî (azînlîk) kî çandî bijî, pîranî wê li derveyî welat be. Ev qedera hemû mîletan e. Em li dinyayê belav dibin. Alman jî wisa ne. Pîrê wan jî li derveyî welatê xwe dijîn. Bîlxîsûs gelên Asya, Afrîkayê pîranî derketine derveyî welatên xwe. Mixabin ev pêvajoyekî dîrokî ye.

Dewam Rûpel 10



'TIŞTÊ KU KURDAN
DIKE MILET
HIŞÊ NETEWÊYÎ YE'

Dewam Rûpel 8-9

Baş e niha, em di konferansekî zanistî de, ku li ser zimanê kurdî hatiye lidarxistin, rastî hev hatin. Vê konferansê di vê wateyê de li dijî asimilasyonê ye.

- Pir ecêb eku her kes bi kurdî xeber dide. Ev jî tewreke siyasî ye.

Çima ecêb e, jixwe li ser pirsên zimanê kurdî tê xebardan, ev çima dibe tewrek siyasî?

- Hinek tişt bi kurdî nayê guftûgokirin. Ji ber ku kurdî nehate pêxistin.

Lê van zimanzanê ku semînerdar in, piranî bi zanistî xebardan û ji bo fêmkirinê pir mûskil derneketin.

- Ji ber ku ev 20 salên dawî kurdî ya nû hatiye avakirin. Piştî derbeya 12'ê Îlonê wan entelektuelê ku xwe avêtin Swêd û Almanayê ji bo çand û zimanê kurdî pir xizmetên mezin kirin. Bi kurdî nivîsandin, roman, çîrok, şano û helbest nivîsandin. Tiştên berê ku bi tirkî hatine nivîsandin hatin wergerandin. Vêje ya dinyayê hate wergerandin.

Ev jî nîşan nade ku zimanê kurd azad be, wê bi pêşkeve?

- Ji bo rêxistineke neteweyî girîngî dayina lîsanê pir muhîm e. Tiştê ku kurd û tirkan ji hev diqetîne lîsan e. Qet têkilî bi hev re nîn e. Hûn kurd ji alî lîsan ve dirûv bi me dixin. Bi Alman û Holendayîyan re.

An jî hûn dirûv bi kurda dixin!

- Jixwe li gor mirovên wek Cemal Nebes, em jî kurd in!

Belê, mirovatiya me heye. Hişk dibêjin Aryan, bezên me jî yek in! Ez dixwazim li ser başûrê Kurdistanê ji ditîninê te bigirim, tu rewşa wir çawa dibînî?

- Ji bo wir ez pir bêhêvî me. Partiyên wan li gel pir xerabî kirin. Şerê birakujyê bû xwekuji. Tiştên herî xerab jî evê ku her tişt bi kurdan ve ne girêdayî ye. Her tişt bi Amerika ve girêdayî ye. Ger ku ambargoya li dijî Sedam rakê wê Kurdistanê Başûr nemîne. Serokên kurd xwe bi Amerika ve pir girêdan. Girîng e gel li ser van zixta deyne. Ê ku îro Kurdistan îdare dikin komek aristokrat in. Ê ku şerê birakujyê dixwaze ne gel e. tu qeweta gel nîn e. Ez rewşê pir xerab dibînim.

**Hevpeyvîn:
FAYSAL DAĞLI**



Piştî ku helikoptereke Skorskî ji aliyê hêzên ARGK'ê ve hate xistin, dewlet kete nav ponijînê:

'GELO SAM 7'ÊN PKK'Ê PIR IN?'

Ji 13'yê rêbendanê û vir ve di navbera hêzên ARGK'ê û hêzên dewletê de şer pir dijwar dibore. Li navbera Hênê, Licê û Dara Hênê de, gerilayan helikopterek xistin. Li Amedê û li Botanê operasyonên hêzên dewletê û êrişên gerilayên ARGK'ê didomin.

13.1.1995

Li çola Çinarê, hêzên dewletê ketin kemîna gerilayên ARGK'ê, 10 cerdevan û gelek leşker mirin, gelek jî birîndar bûn.

Li der dora navçeyên Amedê; Licê, Dara Hênê û Hezroyê hêzên dewletê li gundiyan pêkuyî dikin û dest datînin ser qûdên wan.

Li Edeneyê, li taxa Hürriyetê bombe teqiyen. Kesek bi navê Mecit Oğuz mir. Tu kesî ev livbazî negirtin ser xwe.

Li Amedê, li gorî agahiyên ku ketin destê me, 4 xwendevan ji aliyên Zankoya Dicleyê ji aliyê polîsan ve hatin înfazkirin. Ew xwendevan li derdora xwe, wek sempatîzanên TDHP'ê dihatin nasîn.

Li Edeneyê, kontrgerîla qehweyek gulbaran kir. Kesekî bi navê H. Bahattin Oğuz

mir, 8 kes birîndar bûn.

Li ser gundên Pûlûra Dersimê, ambargoya hêzên dewletê ya qûd (zad) didome.

Li Êlihê, xwendevanekî bi navê Zahir Balan hate kuştin. Zahir Balan, li der dora xwe wek welatparêz dihat naskirin. Tê gotin ku, qatîlê wî endamên kontra ne.

14.1.1995

Di navbera gerilayên ARGK'ê û hêzên dewletê de li Dara Hênê şer derket. Di şer de serbazek û 2 uzman çawîş û 2 gerîla mirin.

Gerilayên ARGK'ê operasyona hêzên dewletê ya li ser çiyayê Cûdî bêencam hişt. Di vê oprasyonê de gelek leşker mirin, 3 gerîla û gelek leşker birîndar bûn.

Gerilayan di navbera Hênê, Licê û Dara Hênê de helikoptereke Skorsky xistin. Di helikopterê de "albayek, binbaşiyek, yûzbaşiyek, ûsteğmenek, astsubayek û uzman çawîşk" mirin.

Li Girgê Amo (Silo-pî) hêzên dewletê qerekola gundê Darekayê, ji ber êrişên gerilayan vala kir.

15.1.1995

Li Erxenê li gundê

Salihliyê, gundiyan û cerdevanan (li ser cerdevaniyê) bikevir û daran li hev dan, 18 gundî ji aliyê hêzên dewletê ve hatin girtin.

Li Cizîra Botan 5 cerdevan bi çekên xwe ve gihîştin gerilayan.

Li Sasona Êlihê, şivanekî bi narincoka destan birîndar bû.

Li Pasûra Amedê, gundên Dehaz, Zara, Samsor, Goman, Zîkê, Baluzîkê ku ji aliyê hêzên dewletê ve hatibûn valakirin, hatin şewitandin.

Li Hênê, li gundê Vişkiçorê, di navbera gerilayan û leşkeran de şer derket. Di şer de serbazek û leşkerek mir, 3 uzman çawîş jî birîndar bûn.

Erebeyeke leşkeran û kamyonek li navenada Amedê li hev qelibûn. 3 leşker û şiferek birîndar bûn.

Gerilayan li gundê Tiyaks ya Pasûra Amedê, êrişî cerdevanan kir, 4 cerdevan û 3 xunamîyên cerdevanan mirin, 6 cerdevan û lêzîmên wan birîndar bûn. Gerilayan 5 cerdevan girtin û bi xwe re birin.

16.1.1995

Di navbera gerilayên ARGK'ê û leşkeran de di sêgeha Xanî, Licê û Dara Hênê de şer derket. Di şer de as-

teğmenek, 3 uzman çawîş û 20 leşker û 4 gerîla mirin.

Li nêzîkî Licê li mintiqeya Grosidê gerilayan û leşkeran şer kir. Di şer de 5 leşker mirin.

Gerilayên ARGK'ê li mintiqeya Omeriyanê êrişî leşkeran kirin. Di êrişê gerilayan de gelek leşker mirin û gelek jî birîndar bûn. Gerilayan dîrekên telefonê jî taxrîp kirin.

Li gundê Narlıçayê, li Pasûrê, gerilayan êrişî cerdevana kir. Di êrişê gerilayan de 20 cerdevan û kontra mirin.

17.1.1995

Riya Êlihê, piştî nivroyê ji aliyên gerilayên ARGK'ê ve hate birin. Gerilayan di kontrolê de otobosek şewitandin.

Li Şemzînanê, li mintiqeya Oramarê, cerdevanek pê li mayîna gerilayan kir. Cerdevan mir. Leşkerekî kurd ji bo ku dernekeve operasyonan xwe birîndar kir.

Trêna "Ekspresa Kurtalanê" (Misirc) li nêzîkê gundê Şêx Ünîs ji aliyê gerilayan ve hate bombe kirin. Ekspres wergeriya, makînist birîndar bû.

18.1.1995

Sekreterê HADEP'ê

yê Êlihê, Zeki Adlığ hate kuştin. Tê gotin ku qatîlê wî endamên kontrgerîla ne.

Treçtora cerdevanan li Şirnexê, li gundê Şikestiyên li mayîna gerilayan leqitî. Cerdevanek mir, treçtor texrîb bû.

Gerilayan avêt ser cerdevanê gundê Selanê, 3 cerdevan mirin, 6 cerdevan birîndar bûn.

Greva birçîbûnê li girtîgeha Buçayê kete roja 30'yan. Li Aydinê kete roja 20'an.

Narincoka (bombe) destan di destê zarokan de teqiya. Du zarok mirin, zarokek birîndar bû. Bûyer li Dersimê, li Mêzgirê, li gundê Yazelî pêk hat.

19.1.1995

Di êrişê gerilayan de li Êlihê, li Sasonê, li gundê Şêxayê 5 cerdevan mirin, 5 cerdevan birînxedar in.

Li ser qereqola Helîla ya Kerboran û qereqola Derya ya Şernexê ve gerilayan girt. Di cerda gerilayan de gelek leşker mirin û gelek jî birîndar bûn.

Gerilayan di navbera Pasûrê û Farqînê de êrişî leşkeran kir. Di êrişê gerilayan de 4 leşker, cerdevanek û gerilayek mirin.

Navenda Nûçeyan

ZIMANÊ KURDÎ Û TÎPÊN LATÎNÎ

KIRASÊ ZIMÊN FIREHTIR BIKIN

Em dinêrin nivîskar û zimanzanên me hewl dane ku ziman xerab bikin. Ew dizanin, xerakin ji avakirinê hêsantir e. Tirkan ji wiha bi serê xwe kirine. Tîpên Q,W,X nexistin alfabe ya xwe, zimanê xwe seqet kirin. Lê ev heftê sal in, dikin û nakin zimanê tirkî sererast nabe.

Zimanê kurdî zehf dewlemend e, adan awayî serê ga dê ji denê derkeve. Rabûn kêr dane stuyê gayê beş, serjêkirin. Serî kete binê den asêtir bû. Bûkek wan biyanî (xerîb) hebû, ji wan re got, "Denê dimsê bişikînin ku serî derkeve. Pêşî hûn bi min bişewirana me serê ga jenedikir. Rabûn den şikenandin, serê ga bi hêsanî derxistin, lê ga li ser bêaqiliya xwe dan der.

Zimanê kurdî zehf dewlemend e, adan awayî berdar e. Bav û kalên me, di bin her cure pers, pêkûti, zilm û zor-dariyê de, bêdibistan û zanîngêh, bêalfabe, nexwendî, bi devkî û bi saxlemî zimanê xwe parastine, gihandine roja îro, radestî me kirine. Di derfetên îroyîn de ku, zehfên me xwendevan in, nivîskar û rewşenbîr in, li Ewropa, Amerîka û Sovyetê dijîn, jîr û zana ne. Ev ronakbîr, nivîskar û zimanzanên me, ji dêla ku zimanê kurdî fireh, dewlemend û geştir bikin, em dibînin û dibihîzin ku dibêjin, "Zimanê kurdî zehf fireh e, bi şax û per e, di alfabe ya latînî de hilnayê (bi cih nabe), divê em şax û perên wê bixesixînin, teng bikin ku di alfabe ya latînî de hilê û bi cih bibe. Ango ji mirovekî re kirasekî dirûtî anîne, lê ew kiras li vî mirovî re teng û biçûk e. Ji bo ku ew kiras li wî mirovî bê (biedile), divê hinek ji zend û çimên wî mirovî bête jêkirin. Ji cawê wî kirasî hinek caw di destê wan de heye lê têngahijîn ku qetek caw bi ser zendik û derdawa kiras de ve-kin, kiras dirêjtir û firehtir bikin.

Alfabe û denê dimsê
Vê rewşê, henekek Helexiyan anî bîra min. Li Gundê Helexê gayekî serê xwe xistibû denê dimsê, tê de asê mabû. Gundî giş lê civiyan, fikr û ramanên xwe gotin lê serî ji denê dimsê derne-diket. Dawiyê civatek saz kirin. Wê civatê ji bo rizgarkirina ga, biryara serjêkirinê standin. Bi vî

awayî serê ga dê ji denê derkeve. Rabûn kêr dane stuyê gayê beş, serjêkirin. Serî kete binê den asêtir bû. Bûkek wan biyanî (xerîb) hebû, ji wan re got, "Denê dimsê bişikînin ku serî derkeve. Pêşî hûn bi min bişewirana me serê ga jenedikir. Rabûn den şikenandin, serê ga bi hêsanî derxistin, lê ga li ser bêaqiliya xwe dan der.

Xeletiya tirkan
Ez hêvîdar im ku nivîskar û zimanzanên me nekevin rewşeke wiha. Ya ji xerabkirina ziman an ji bikaranîna tîpekê ku di alfabe ya latînî de heye. Em dinêrin nivîskar û zimanzanên me hewl dane ku ziman xerab bikin. Ew dizanin, xerakin ji avakirinê hêsantir e. Tirkan ji wiha bi serê xwe kirine. Tîpên Q,W,X nexistin alfabe ya xwe, zimanê xwe seqet kirin. Lê ev heftê sal in, dikin û nakin zimanê tirkî sererast nabe. Ji Wanê re dibêjin, "Van", ji qumarê re dibêjin, "kumar" û ji dewletê re dibêjin, "devlet" û hwd.

Zêdebûna dangan
Derdê me ne bikaranîna kumika (^) li ser tîpa (i) ye. Divê niqte û divê ji kumik li ser hebe, tu zerarek berbiçav li zi-

man û rêziman nake. (i), (î) û (î) derî babeta me ye. Babeta me tîpên Ç, K, P, T ne û çar dengên nêzîkî van dangan in. Zêdebûna dangan, dewlemendbûna ziman e. Zimanê kurdî dewlemend e, berdar e, di alfabe ya feqîr û teng de hilnayê. Ango bi alfabe ya teng û feqîr nayê bikaranîn. Ev pirsgirêk ne di zimanê kurdî de tenê, di zimanê îngilîz, fransîz û almanî de jî heye. Ew çend dengên ku di alfabe ya de nîn bûn, tîpa (h) bi dengên bingehîn re bi kar tînin, dengê nêzî wî dengî pêk tînin (ch, ph, sh, th û sch) alfabe ya xwe fireh kirine. Bi vî awayî dewlemendbûna zimanê xwe parastine.

Mînaka diyez û bemolê
Nivîskarno, ziman-zanno, ger hûn nizani-bin, ji dengbêj û sazben-dan bipirsîn, bê ma mu-zîka kurdî bi gîtarê tê gotin an na? Diyez û bemolên muzîka kurdî zêde ne. Feqet di gîtarê de, di navbera du dengên bingehîn de di-yezêk û bemolê heye. Ji ber vê yekê muzîka kurdî bi gîtarê nayê lêxistin. Ango perdeyên wê têrê nakin. Ger sazben-dên me ji gîtarê pê ve nizani-bin tu amûrên din ên

muzîkê bi kar bînin, divê ew sazben-dêk perdeyan (diyez û bemolan) bavêjin ser boçika gîtarên xwe, wê demê dikarin "Delalê Malê û Derwêşê Evdî ji pê bibêjin.

Çewtiya mezin
Hinek ji nivîskar û zimanzanên me wiha difikirin û difermin, "Bila zimanê nivîskî ji yê xwendin û axaftinê cuda bibe, zerar nîn e. Piştî hîndekariya zimanê kurdî yê nivîskî, bila biçin herêmê hîni zimanê xwendin û axaftinê bibin." Ev jî çewtiyeke herî mezin e. Eceb hînbûna zimanekî bi cureyan dijwar e an bikaranîna tîpek nas ku di alfabe ya de heye, em bidin ber tîpekî din, wî dengî nerm bikin dijwar e? Ango ç, k, p, t bi tîpa (h) nerm bikin, dangan pir bikin û zimanê xwe yî dewlemend biparêzin: "ch, kh, ph, th). Îro em van dangan bi kar neyîn, çend salên din em dê gelekî li paş bimînin û poşman bibin. Di pêşerojê de nav û bêjeyên me dê li hev siwar bin; zimanê xwendin û nivîsandinê jî bibe yek. Bikaranîna tîpa (h), tu pirsgirêkê ji rexê kom-pîturen ve jî nîn e.

Î. OMERÎ
Wê bidome

DEFTER

Exlaq û prensîbên wergerandinê



DILBIXWÎN

Li Moskovê di dema Konferansa Kurdî de li navenda Enstîtuya Rojhilataniyê me gelek dîrokzan, lêkolîvan û Kurdzan nas kirin. Di nava wan de zimanzana hêja Dr. Zerê Yusupova eşkere di hate dîtin, ew ji Lenîngradê hatibû. Axaftina wê li ser zimanê kurdî bû. Piştî konferansê careke din me li Komeleya Kurdî —niha bûye Mala Kurdan— hev dît. Ji bo Konferansa Zimanê Kurdî ku wê li Berlîne bihata lidarxistin, me ew vexwand (dawet kir), bi dilgeşî daxwaza me pejirand. Dema xatirê xwe ji me xwest, sozek da me: Eger ez sax bimînim, ezê ji we re hinek pirtûkên mamoste Qanatê Kurdo bînim, bila diyarî bin. Hûn ji bo gel dixebitin, mirov çî bide we ne poşman e. Bawer bikin ezê ji we re gelek nivîsarên hêja bînim, meraq nekin..." Niha mamoste Zerê mêvana me ye, wekî semînerdar beşdarî Konferansa Zimanê Kurdî bûye. Hinek berhemên xwe, hinek ên Qanatê Kurdo û hinek jî yên nivîskarên din, soza xwe anî cih û ji me re tûrekî dagirtî anî. Min dest avête pirtûka nemir Qanatê Kurdo ya li ser gram-era kurdî. Pirtûk bi du zimanan, kurdî û rûsî amade kiriye. Hate bîra min, min ew pirtûk berê xwendiyê. Ew ji aliyê Weşanên Roja Nû û Koralê ve hatiye çapkirin û weşandin. Lê cudabûneke mezin di navbera herdu pirtûkan de heye. Pirtûka min berê xwendibû û ya niha di destê min de, gelekî ji hev cuda ne. Gelo, ez şaş im, an jî şaş hatiye wergerandin? Piştî konferansê hema yekser ez berê xwe didim Enstîtuyê, pirtûka wergerandî ji pirtûkxaneyê dertînim û herduyan bi hev re dinirxînim. Helbet

mirov di pirtûka Qanatê Kurdo ya wergerandî de, pirtûkeke din dibîne. Alfabe ya din, rênivîs û rêzimanekî din. Di bin navê nemir Qanat de, berpîrsiyarên weşanxaneyan nêrînen xwe anîne ziman û li gorî daxwaz û dilê xwe ew wergerandine. Mirov ecêbmâyî dimîne. Sedem çî ye, ji bo çî prensîbên wergerandinê nayêne parastin? Eger tu bi alfabe ya mirovekî wekî Qanatê Kurdo, Celadet Bedirxan ne razî yî, pirtûkên wan çap neke, wernegerîne. Heke te wergerand jî, dirust be û exlaqê wergerandinê nerûxîne. Ez berpîrsiyarên van herdu weşanxaneyan nas nakim, ne pêwîst e jî, lê belê ew pirtûka ku di bin navê Qanat de wergerandine û ew ji xwe re kirine sîwan, tu caran ne di cihê xwe de ye, ew ne pirtûka wî ye. Qanatê Kurdo di sala 1978'an de li Moskovê pirtûk çap kiriye. Van biraderên me jî di 1990'an de Roja Nû Koralê jî di 1991'an de tenê bi tîpên Latînî ew "wergerandine" û weşandine. Ji bo ku xwendevan van dijberiyên eşkere bibînin, ez çend nimûneyan pêşkêş dikim. Alfabe: Alfabe ya ku Qanat bi kar aniye ya nemir Celadet Bedirxan e, ku Hawar pê derdixist. Tevî hinek reformên biçûk, Kurdoyêv bi du zar-avayên kurdî; kur-mancî û soranî berhe-meke hêja pêşkêş kiriye.

Dewam Rûpel 15

Çağdaş Zülfikar: "Kesên ku eslê xwe înkâr dike heramzade ne!"

Kovareke nû bi navê "Çağdaş Zülfikar" (Zülfikarê hemedem) dest bi jiyane kir. Kovara ku ji 32 rûpelan pêk hatiye bi giranî li ser civaka elewî û der barê bîr û baweriyên vî civakê de ye. Bi uslub û nêrîneke cihêreng li ser meseleya elewîtiyê sekiniye û dibêje ku parêzvanê rasteqîn yê elewîtiyê wê ew be. Di dest-pêkê de ev cumle heye: Zülfikar ji hemû kovarên din cihêreng û li dij wan kesan e ku ticareta elewîtiyê dikin û bi bîr û baweriyê gelê me dilîzin. Nivîsa derketinê bi vî cumleyê diqede: "Zülfikar gotina rast a elewîya ye û bang e ji bo têkoşinê."



Xizmeteke pir berfireh bi helbest û edebiyata kurdî kiriye. Yek ji wan karên wî ku di dîroka me de bi geşî cih digire, amadekirin û weşandina rojnameya Jîn e. Ew kovar, wî bi xwe bi rê ve dibir û heya mirinê bêsistî û piçrîn hemû hêza xwe ya rojnamevaniyê da wê rojnameyê.

Hacı Tofiq, navê rasteqîne yê wî ye û di sala 1867'an de li Silêmaniyê ji diya xwe bûye. Piştî ku di medreseyê de fêrî xwendin û nivîsandinê dibe, dilê wî tijî hezkirin dibe ji bo helbestên Hafîzê Şîrazî. Mîna kurdî zimanên erebî û farisî fêr dibe. Di sala 1882'an de li Silêmaniyê dibe karmendê (memûr) nifûsê, pişt re ji wezîfeyên din digire destên xwe. Sala 1891'an diçe paytexta (serbajar) Osmanîyan Stenbolê, li wir di demeke kin de xwe bi navenda rewşenbîrên wê demê dide qebûlkirin, ku bi jîriya wî dihesin, bi taybetî jî şarezahiyê wî di warê zimanê erebî û farisî de. Osmanî nasnavê Beg didin wî. Piştî ku li Stenbolê xwendina xwe ya hiqûqê diqedîne, parêzeriyê (ebûqat) dike. Meraqa wî ji bo karê rojnamevaniyê çêdibe û ji

derdora xwe re hizira weşandina kovarekê dibêje. Bi qîzeke tirk re dizewice, ji wê jînê qîzek û du kurên wî çêdibin. Di sala 1899'an de dibe qeymeqamê Hekariyê û di sala 1918'an de jî dibe Waliyê Amasyayê. Di dema damezirandina komarê de dev ji jin û zarokên xwe ber dide û vedigere Silêmaniyê.

Xizmeteke pir berfireh bi helbest û edebiyata kurdî kiriye. Yek ji wan karên wî ku di dîroka me de bi geşî cih digire, amadekirin û weşandina rojnameya Jîn e. Ew kovar, wî bi xwe bi rê ve dibir û heya mirinê bêsistî û piçrîn hemû hêza xwe ya rojnamevaniyê da wê rojnameyê. Cihê wê jî mala wî bû, ku nav lê kiribû "Qelenderxane". Li başûr di navenda rewşenbîran de ew mîna Tolstoy tê binavkirin û yek ji mirovên "Renaissance" yê civaka me tê hesibandin. Berhemên wî bi soranî û bi herfên erebî hatine weşandin. Cara pêşîn diwana wî ji aliyê Muhemed Resûl Hawar ve hatiye amadekirin û belavkirin. Di destpêka 1970'yan de jî, ji aliyê Kakey Felah ve pendên wî hatin weşandin.

Pîremêrd tenê ne helbestvan, rojnamevan û feylesof e jî. Wî her sal jî bi serê xwe amadeyiya cejna Newrozê dikir, baştir û xweşiktir ew cejn bi gel da naskirin Ji aliyê rejîma Iraqê ve jî ew cejn tê qedexekirin. Pîremêrd kartêkê belav dike û çend peyvên li ser dîniyê: "Di salên buhurî de me agirê Newrozê li girê Mameyarê pêdixist, lê îsal em di nava kezabên xwe de çêdikin."

Di warê felsefeyê de

Ne qeymeqambûn ne jî walibûn ew bextiyar nedikir

TOLSTOYÊ GELE KURD:



PÎREMÊRD

ramana xwe bi helbestan dida saloxkirin. Di wê cureya helbestê de di nava edebiyata kurdî de Pî-

remend taqane ye. Zêdetirî 6000 pendên wî hene. Gavekê navbera wî û Şêx Mehmûd Berzencî xerab

dibe û kesên xerab jî peywendiyên wan xerab dikin. Pîremêrd helbesteke felsefî jê re dişîne ku di

edebiyata kurdî de cihêkî pir girîng digire. Piştî ku Şêx Mehmûd wê helbestê dixwîne zor spardarê Pîremêrd dibe û navbera wan jî, ji nû ve çêdibe:

"Ebê beşinde mil keç ka le astî mûçexorî xoy
Sûrahî ser firû dênê le bo piyale ke têka boy

Ke aw darî le ser ser girtûwe eyzanê çî tiya ye
Le lay nenge ke perwerdey nuqum ka gewreyî wa ye.

Pîremêrd jî xeynî van berhemên hêja jî pir nivîsên jî bo şanoyê jî nivîsîne, wek: "Mehmûd Axay Şîwekel, 12 Siwarey Merîwan û kurtasiya Mem û Zîn". Pîremêrd di gel van tiştan jî gotarên pir binirx ji bo Jînê nivîsandine. Li ser zimên zehf xebat kiriye û berhemên hêja wergerandine ser zimanê kurdî. Bi rastî wî heya mirinê dev ji pênuşa xwe bernedaye. Di 15.6.1950'an de helbesta xwe ya dawîn di Jînê de diweşîne. Di 20.6.1950'an de diçe nava karwana şehîd û miriyên mezinên gelê me, li Girê Mameyarê tê veşartin, ku daxwaz û wesiyeta wî bi xwe bû.

Perawêz:

Benden / Cihê bilind di çiya de ku tav jê der tê
Qelenderxane / Cihê ku mirovên tede ne, her dem ji bo çand, huner û zanistê dixebitin. Mirovên ku li wir in jî Qelender in.

Pend, Pendi Pêşinan / Gotinên Pêşiyân.

Çepke gul / Deste gul. "Tirkiya wê Bûket".

Bexşinde / Kesên dest û çav têr ku arîkariyê bi mirovên din re dikin.

Mûçe / Meaş.

Mûçexor / Memur.

PISMAM

Serpêhatiyeke şairê kurdê welatparêz Cegerxwîn:

Heke law ji bavê xwe be, pê re xayintiyê nake

Gelî xortan! Eger hûn ji xwîna kurdan bin hûn min nakujin. Ez wekî wî mirovî mala we belav nakim, ez xesarê nadime gelê kurd. Ez malên we didime hevdû û diparêzim. Dixwazin min bikujin, hûn naçin cenetê û hûnê bibin xayinê gelê xwe.

Cegerxwîn, dema ku li bakur e, qerara xwe dide ku derbasî Binxetê (Sûrî) bibe. Riya wî divê di Cizîrê re bibihure. Wê demê li Cizîrê şexekî çehş hebûye. Dibihîze ku Cegerxwîn wê di Cizîrê re derbasî Binxetê bibe. Dixwaze di rê de tiştêkî bine serê Seydayê Cegerxwîn. Çar feqiyên xwe dişîne pêşiyê û ji wan re dibêje:

-Cegerxwîn wê di Cizîrê re derbas bibe. Ev kes mirovekî xayin e. Heke hûn wî bikujin wê Xwedê ji we hez bike.

Feqî didine ser rê. Bêhnêkê disekinîn, dinihêrin ku zilamek ji wê de tê, wî disekinînin. Navê wî jê dipirsin. Zilam ji wan re dibêje ku navî wî Mele Şêxmûs e û jê re Cegerxwîn jî tê gotin. Ji wan dipirse:

- Xêr be, hûn çî dixwazin gelî xwarziyan?

Yek ji feqiyên dibêje ku şêx ji wan re gotiye Cegerxwîn bikujin. Li ser vê bersivê, Cegerxwîn dibêje: "Doza we bi min re çî heye? Çima hûnê min bikujin?" Pişt re wan dide rû-

niştin û dibêje:

- Hûn min dikujin bikujin, lê pêşî ez dixwazim ji we re çîrokekê bibêjim.

Feqî daxwaza wî qebûl dikin. Cegerxwîn dest bi çîroka xwe dike:

Li gundekî mirovek hebû, bi sê zarokên wî û jina wî ve tev pênc kes bûn. Ev zilam qumarbazekî jêhatî bû. Lê ji ber qumara xwe tu tişt nedida ser hev. Malên xwe jî firot û di rîya qumarê de da. Gundiyên wî jî alîkarî nedanê. Zarokên

wî bi tişt miştên gundiyan demekê debara xwe kirin. Demek hat gundiyan nan û dan nedan zarokan jî. Ji lawê wî xwestin ku bavê xwe bikuje. Lawik gelek fikirî, pişt re qerar da ku bavê xwe bikuje.

Rojekê dişa bavê wî nava şevê tê malê. Lawik tivingê dike destê xwe û li pêşiyê radiweste. Bav ber bê tê, dinihêre ku rewşa lêwik pir ne xweş e. Lawik bangî bavê xwe dike, dibêje:

-Eger tu gavekî jî biavêjî,

YEW FÎLM YEW SERMIYAN:



PLATOON

(Bi kirdkî)

Sermiyar: **Oliver Stone**
Seneryo / Nuştok: **Oliver Stone**
Welat: **USA**

Oliver Stone, 1968 di eskereya xwi qedêneno. Wexto ki Vietnam ra yeno, hiş miş ê jey sere dê niyo... Heze ki beng werdo... Hizûr mizûr ê jey nêmento, biyo hezey dengêser... Nêzane seko senêko. (I)no beyntar di cenî menîda xwi ra cêra beno... Welhasilî çend serrî di ancax xwi yeno...

(I) no beyntaran di skandalê Watergate beno!.. Stone, hetona inî

wexto anasar palîtîqayan sero wêşî çî nêzane, hîndasî xebardar niyo... Stonê, hewnîyeno ki, dewlet (welat), enî gu-rendi watergate sero seniwa zûra, dalawera kenna se Vietnam û Ho Şî Min sero zî zûra kenna, mîlet xapênena...

Yew wext pî jey zî vatê: "Enî komînistî pî-sî, nêbiyayey" de mevajî ki enî vatişî pêro zûrî-bî...

Oliver Stone, ayê fikîrandî xwi no verênena tikê... tadiyaheno, beno he-tî heqliya, mazlum a...

Stone, da des serrî ra pey seneryoy "Platoon"î anceno fîlm... 1987 ti Festivalê Berlîn dê xelaya zerên ê gêno.

Novelanê film da "Platoon"î Vietnam di veyreno. Oliver Stone Vietnam di çî diyo, çî ameyo seredê jey û embazan di jey ser, esker a Vietnam di çî bêj qatlî-am kerdo, gedey gudey seniwa kiştî, cay caragî seniwa veşnay? hema hema ênîna pêrin fîlm da xwi di nawneno...

Labelê Stone, yew çî newano, persnêkeno. Nêvano ki: "Ma wita (Vietnam) di çê geyrenê, çî kar û gûreyma wita esto, ma seba çî, kamî witayê?" anasar çîyo...

Enî pêro yew ca, şima şênê ina fîlm temaşe bikê....

CEMAL PÎRANIJ



ezê te bikujim. Bav "çima lawo?"

dibêje. Lawik bersivê didê:

-Heta niha me qedand, lê êdî bes e. Em hew îdare dikin, tu ji me re nabî. Bav jê dixwaze ku gazî diya xwe bike. Lawik gazî diya xwe dike. Dê tê, zilam jê re dibêje:

- Rast bêje, Di bextê te de ew law ji min e an na? Jinik soromoro dibe, dibêje mêrê xwe: "Ez ji dilê rast ji te re dibêjim. Lawik ji te ye, ne ji tu kesî din e."

Dema jina wî wer dibêje, zilam ber bi lawê xwe ve dimeşe. Jinik gazî û hawar dike ku ew ber bi lê-wik ve neçe. Mêrik dibêje: "Heke ew ji min be nikare min bikuje." Zilam nasekine, bi ser lawê xwe de diçe. Lawik hêrs dibe, nizane wê êdî çî bike, disekine. Devê tîvinga wî berjêr dibe. Bav diçe tîvingê ji dest distîne. Lawê xwe

hembêz dike, maç dike û jê re dibêje: "Tu lawê min î, ez malê belav jî bikim, xerabiyê jî bi te bikim, tu nikarî min bikujî."

Cegerxwîn çîroka xwe diqedîne û dizivire ser feqiyên xort:

-Gelî xortan! Eger hûn jî kurd bin, hûn min nakujin. Ez wekî wî mirovî mala we belav nakim, ez xesarê nadime gelê kurd. Ez malên we didime hevdu û dipaêzim. Dixwazin min bikujin, hûn naçin cenetê û hûnê bibin xayîne gelê xwe.

Piştî wan gotinên Cegerxwîn pir bi ber xwe dikevin û jê efûya xwe dixwazin. Cegerxwîn jî radi-be çavên wan maç dike û wê ji wan dixwaze:

- xebatê bikin ji bo xelasiya welatê xwe û gelê xwe.

ÇIYA MAZÎ

REWÊZ

(Be soranî)

Werin salî Ehmedî Xanî bikeyn be salî zimanî kurdîş

Le pêşwazî salî Ehmedî Xanî da, zor kesan qîsey xoyan kird û hîway ren-gawrengî fireyan bo salî nawbiraw xwast, diyar e êmeş telle gullî deng man dekeyne naw ew deskene dengane û şan be şanî ewan deyanxeyne ser rêgay hîwa û awate geşekan. Belam serbarî hemû ew hîwayane ke gelê hezî mezin degrine amêz, hîwayekî tirîş man heye ew îş be aqarî ziman da deçê. Dezanim dellên dîsan ewe ziman?! Bellê dîsan ewe ziman, ziman û ziman... Ew qonaxî le ser westandine ye ke natwanî bê wî bigeyne menzillî dilîniyayî û şitêk niye sazişî le ser bikrê. Xizmîne: Le min baştir dezanin, gelî bêziman ne gel e. Mirovî bê ziman îş mirovêkî bêruh e û natwanê guzarîşt le xwastekanî xoy bikat.

"Zimanit be birîn çê." Le kurdewarî xoman da em nizaye be tûk-tîrînin nizaye ke le bedreftar û bed gutaran kiraye, ca nazanim ême nefrîn û tûkman lê kiraye wa xoşman bûyne be harîkarî dîjmine ser şêt û sererrokeman û zimanî xoman be birîn daye.

Bawe pêrrey turkan le dîwexanî qelemrewêtî da rûy kirde dest û pêwendekanî û wîti: "Dezanin bo nemantiwanî welatekanî Balkan bixeyne jêr ballî deselletman ewe?!" Her xoşî be bersiv hat: "Cûnke zimanekeyan man lê qedexe nekird." Ey dezanin ew geley ke be dirêjayî 70 sal ziman, çand, dab û nerîtyan lê zewt û heram kird, dîsan

neyantiwanî ta ser bîxene jêr ballî reş û şûmî hez û wîstekaniyan ewe. Eme xoy bellge û gewahî resenêtî kurd û zimanekeyetî. Ca de werin ba hemû man xwedî le zimanekeyan derkewîn û bibîne baxewanî ew baxçe renga w renga pir le wişey kurdî ye. Werin ba çî dî nehêlîn be berdî dîjminan man awî kaniyekan man şilwê bin, ew dîjminaney ke teryan lê hel luşt û berdî rîqîş yan tê hawîşt, werin be destî mîhir û wefa rûnî bikeyn ewe û şewqî mirwarî hundurî jînge man bo roşin katewe.

Werin le salî Homîrosî kurdan da be hevra "mal awayî" le zimanî bêgane bikeyn û ew xwane bipêçin ewe ke sepênrawe be serman da û le ser xwanî kurdewaryane man kom bibîn û be zimanî şîrînî xoman bipeyvîn. Dayikanî kurd werin minalanî çawgeş û kakol zêrîn be jekî kanî kurdewarî firçik biden. Werin ba têkra le salî Ehmedî Xanî da zimanî ew bawe gewreye bikeyne wêrdî ser ziman, bew zimane bidwêyn û bifîkrîn ke zimanî evîn û sewdaseranî Mem û Zîn asa ye. Erê bêt yan jî nerê, ew zimane man be mîrat bo mawetewe û zimanî kesîtir nabê bê mulkî me, cige lewey bê zimanî xobedestewedanîş e. Kiçîne... Kurrîne, werin piyawî çak bin û le salî 1995 da em hevokî: Ez bi kurdî nizamim, Bigorîn be: Ez bi kurdî dizanim.

SÎRWAN NANEREQ



ŞEHÎDÊN GEL

Çiyayê Hezexê
 bidûman e
Dijmin tev de
 darişan e
Nîzam, Hamid û
 Zekiya
We can bo
 Kurdistanê dane
Riya we riya me ye
Doza we doza me ye
Şehîdbûna we
Serhildana me ye
Hûn şehîdên
 gelê me ne
Canfidayên
 xelkê me ne

*Ji taxa Şakirpaşa,
 Edene
 Keçikeke welatparêz
 a 13 salî*



*Tekoşin
 Serkeft*

– Silo tu çend salî yî,
 çend xweng û birayên te
 hene?
 – Ez neh salî me. Em heft
 xweng û du bira ne.
 – Hûn çend sal li
 Stenbolê sekinîn?
 Du salan.
 – Li kîjan taxê hûn man?
 Li Hacı Husrefê
 – Bavê te çi kar dikir?

Di navbera mamoste û şagirtekî de axaftinek

Me ji wî re mîdye
 dişûştin, wî jî difiro.
 – Te ji wir hez kir?
 Na... Parkên wê pir bûn.
 Lê em nediçûn. Nêremê
 hebûn. Mamoste nêremê
 carek ji min re dest hejand.
 – Tu ji vir hez dikî?
 Erê. Lê kûçikên vir pir in.

– Her roj firfirok (balefir)
 diçin û tên. Tu ditirsî?
 Na. Dayika min gote:
 “Ew diçin li gundan didin.
 Qarişî bajêr nabin!”
 – Tu ji min re kilamek
 dibêjî?
 Na ez nabêjim. Tu bavê
 min diavêjî hebsê.

– Na. Bi sozê mêran be,
 ez tiştêkî nakim. Ez ne
 polîs im. Di guhê min de
 bibêje.
 Silo dev da ber guhê
 min. “Bingol şewtî” ji min
 re got. Min dest li piştê xist
 û got:
 – Aferim ji te re Silo.

Aferim ji te re jî
 mamoste.
 – Silo tu dixwazî dibis-
 tanên kurdî hebin?
 Pêşî fêhm nekir, pişt re
 gula wî geş bû.
 Çi wext vedibe?
 – Di nêzik de kurê min.
 Oox! Ooox!..

JÊHAT GINGIM

N A M E Y Ê N X W E N D E V A N A N

**Zimanek
 neteweyek e...**

Silav, ji hemû destbi-
 karên rojnameya
 Welatê me re. Pêşî,
 we hemûyan ji dil pîroz
 dikim, ji bo ku li hemberî
 her tiştî (zilm û zordariyê)
 Welatê Me li ser pi-
 yan e. Ev ji baweriyê wê
 ya mezin, ji inyada wê
 ya kurd, ji berxwedana
 serê çiyayê... Zanim. Bi
 vê nameya xwe ya kurt
 çend helbestan ji we re
 dişînim. Dixwazim çend
 tiştan jî ji we re bibêjim.
 Ez zanim kurmanciya
 min ne baş e, ji bo nivîs-
 karekî qet ne baş e. Min

bibexşînin. Hetanî du sa-
 lan berê min dixwest ez
 nivîskarekî zimanê tirkî
 bim. Ji bo ku min bi zi-
 manê tirkî dikaribû binî-
 visanda. Di gelek ko-
 varên edebî yên tirkî de
 çîrok û nivîsên min hatin
 weşandin. Di ‘Varlık’,
 ‘İnsancıl’ û hwd’ de. Du
 salan berê min qerar da
 ku ez bi zimanê maderî,
 zimanê diya xwe binîvis-
 nim. Ji bo vê yekê ji du
 sal berê heta îro min
 rêzek bi tirkî nenivîsand.
 Êdî dikarim bi zimanê di-
 ya xwe binîvisim û za-
 nim gelek kêmasiyên min
 hene. Lê di demê de wê
 rast bibin û ezê rast jî bi-
 kim. Ji bo çi kurdî? Zima-
 nek neteweyek e, nete-
 weyek jî welatekî dide
 der. Welatek bînetewe,
 neteweyek jî bêziman
 nabe.

**K.Polat’ê Pîranê/
 Swîsre**

**Welatê Me û
 Realite Press**

Gelî xebatkar û
 zehmetkêşên
 Welatê Me! Beri-
 ya her tiştî dixwazim si-
 lavên xwe yê dostanî ji
 we re bi rê bikim. Ji bo
 xebata we yê pîroz spas-
 darê we me. Ez neçûme
 dibistana, bi îmkanê xwe
 ez hînî xwendin û nivîs-
 sandinê bûm. Bi xêra roj-
 nameya Welat ez kurdî
 zehf xweş dixwînim. Ga-
 va Welat hat dadan ez
 gelek xemgîn bûm. Îro li
 ser hîmê Welat, Welatê
 Me derket. Ez bi vî gelek
 kêfxweş bûm û emrê we

sedsal be.
 Ma qey her rojname tê
 xwendin? Rojnameya Re-
 alite Press, bala min ki-
 şand. Gava min kirî û
 xwend, ez çawa ji darê
 bikevim. Rojname nivî bi
 tirkî û nivî bi kurdî ye. Lê
 naveroka wê ji ya dijmin
 ne cuda ye. Wilo kevira
 diavêje partiye û seroka-
 tiya partiye. Qey tu yê
 bibêjî rêber û serokê kur-
 dan ew bi xwe ne. Lê
 wek tiliyên destan jî hej-
 mara wan tune ne. Ma kî
 dî wan here? Yekî wekî
 min nezan jî dilgenîbûna
 wan fêhm kir û ji wan re
 dibêjim, “hûn bi vê qûşê
 naçin Mûşê.”
 Ez xebatkar û nivîs-
 karê Welatê Me pîroz di-
 kim û wan radimûsim.
 Welatê Me zimanê me
 ye
 Welatê Me ronahiya
 çavê me ye

Welatê Me giranbu-
 hayê me ye
 Her bijî rojnameya
 “Welatê Me”.

İrfan Turan-İzmir

**Xwendin û
 daxwendin**

Rûmeta me (Welatê
 me) hejmara xwe
 ya heştan jî derxist.
 divê ku heşt bibe heştêsd
 û hwd. Lê derxistina hej-
 maran tenê ne bes e. Jîn-
 bûna wê jî bi xwendinê
 ye. Em li rûmeta xwe
 xwedî derkevin û bidin
 xwendin. Êdî bila kes
 nebêje ez bi kurdî niza-
 nim. Qey heya mirov xe-

batekê neke mirov dikare
 hîn bibe? Bi salan, me bi
 zorê tirkî xwend û nivîs-
 sand. Bi darê zorê be jî
 em tirkî, farisî û erebî hîn
 bûn. Çima em bi dilê şa-
 yî zimanê diya xwe hîn
 nebin.
 Gerek e mirov ewil
 zimanê dê hîn bibe. Hîn-
 bûyîn wê çawa bi be?
 Niha ne dibistana me he-
 ye ku kurdî bi me bide
 hînkirin ne jî mamos-
 teyên me. Ferheng, pirtû-
 ka rêzimanê kurdî û We-
 latê Me, divê li ber destê
 we kêmbibin. Pêwist e
 ku em bi serê xwe, bi
 xwendina pirtûk û rojna-
 meyan hînî zimanê kurdî
 bibin.
 Tu car jî bîr nekin,
 Welatê Me bixwînin û
 bidin xwendin. Serfiraz
 bikin. Ji bo ku ev Welatê
 Me, welatê kurdan e.

Eyüp Demir – Çewlik

Bûn deh hefte ku Welatê Me derdikeve. Em dixwazin û dixebitin ku her hejmara nû bêderengî ji ya berê xweşiktir amade bikin û pêşkêşî we bikin. Vê heftiyê me ji hemû heftiyên din zûtir dest bi amadekirina rojnameyê kir. Dilê me xweş bû ku em rojnameyêke pir bedew bigihînin destê we. Lê mixabin li welatên mîna Tirkiyeyê tu garantiya proje, plan û hêviyên ku mirov datîne ber xwe tune ye. Kes nizane li vî welatê kambax kengê, li ku û kîjan pirsgirêk wê derkeve pêşiya mirov û rê li ber mirov bigire. Niha seat 4'ê sibê ye, ez vê nivîsê di nezaretxaneyê qereqoleke Stenbolê de dinivîsim. Ji bo ku em dereng nemînin, min li vê derê firsetek dît û dest bi vê nivîsê kir. Gerçî ev ne tiştêkî nû ye, her roj bêhejmar mirov tene girtin li vî welatê bexîr. Dîsa gelek kes her roj di hundir de dinivîsin. Lê di nezaretxaneyê de nivîsandina ser-nivîsa rojnameyêke ji bo min tiştêkî nû ye. Esas, di demeke ku her roj bêhejmar însan tene girtin de ez naxwazim behsa girtina



Jî Welatê Me

MAZHAR GÛNBAT

"Bila zimanê resmî kurdî be"

xwe bikim, ji xwe mebesta min jî ne ew e. Ev tenê nimûneyeke pir biçûk e ji bêdadiyên ku li Tirkiyeyê diqewimin. Îro (sêşem) saet li dozdeh û nivê şevê dema ez, xwedîya rojnameya me Aynur Bozkurt û Midûrê Navenda Nûçeyan Suut Kılıç em ji rojnameyê derketin û çûn restorantekê ji bo xwarinê, li pey me polîsên sivil hatin û belesebeb em birin qereqolê. Me pirsî ka çima me dibine, gotin: "Giliya we kirine, em mecbûr in we bibin û heta 24 saetan jî mafê me heyê ku em we di bin çav de bihêlin. Eger îcab bike bi rêdana dozger (savcı) emê karibin 15 rojan jî we di bin çav de bihêlin." Ji ber vê rewşê ez nizanim ka emê kengê ji vir derkevin. Girtina me ne prob-

lem e, lê di vê rewşê de derketina rojnameyê, dikeve talûkeyê. Ji ber ku em her sê jî di karê birêvebirina rojnameyê de dixebitin. (Piştî deh saetên din.) Vê gavê seat 2'yê piştî nivro ye. Berî saetekê ji rojnameyê hevalên me û ebûqata me Eren Keskin hatin, li me xwedî derketin. Xebatkarên me gotin ku îro polîsên çape-menyê jî hatine rojnameyê û diyar kirine ku der barê sê hejmarên Welatê Me de (hejmarên 4,5,6) doza pirsyariyê hatiye vekirin. Ji xwe em jî li benda tiştêkî wisa bûn. Ji roja ku dewletê rojnameya özgür Ülkeyê bombe kiriye û bi vir ve, tewra wê ya li hemberî weşanên dijber diwartir bûye. Welatê Me bi kurdî ye, dewlet nikare di cih de nivîsan bide

wergerandin û mudaxele bike. Lê bi derengî be jî tewra xwe li hemberî me jî dide xuyakirin. Niha komserên siyasî di ber deriyê nezaretxaneyê re diçin û tene, li min dinêrin. Yek jê kurd, yê din ereb e. Yê ereb hê jî bawer nake ku rojnameyêke bi kurdî li Tirkiyeyê derdikeve û pir hêrs dibe û dibêje, 'Hûn dixwazin em zimanî kurdî bikin resmî, ê tirkî bila qedexe be, hûn vê yekê çawa dibînin?' Ez ditirsim ku mudaxeleya nivîsa min bikin, ji ber vê yekê ez li vir diqedînim. Çi bibêjim heta niha nebûbû qismet ku ez ji bo vî quncikî di nezaretxaneyê de binivîsim, dewletê ev firset jî da me. Eger di nav 24 seatan de em bête berdan jixwe ezê encamê, li jêr binivîsim. Na ku em neyên berdan, ezê bixebitim ku bi awayekî vê nivîsê bigihînim rojnameyê.

Jêrenot: Ez û Xwedîya Rojnameyê Aynur 20 seatan li qereqolê man û pişt re em berdan. Lê hevalê me Suut ji ber cezayê wî yê kevin şandin Girtîgeha Bayrampaşayê.

WELATÊ ME

Rojnameya Heftiyê (Haftalık Gazete)

Li ser navê ROZA Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti. adina Xwedî (Sahibi) Aynur BOZKURT

Gerînendeyê Weşanê (Yayın Yönetmeni) Mazhar GÛNBAT

Berpirsiyarê Karê Nivîsaran (Yazışleri Müdürü) Mehmet GEMSİZ

Berpirsiyarê Nûçeyan (Haber Sorumlusu) Suut KILIÇ

Redaktor Sami TAN

Berpirsiyarê Têkiliyên Gelêrî (Halkla İlişkiler Müdürü) Sıraç AKSOY

NAVÎŞAN (Adres) Ayhan Işık Sok. No:23/3 Beyoğlu / İSTANBUL

TEL-FAX 249 13 44 - 245 29 91

ÇAPXANE Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.

NÜNERİ (Temsilcilikler)

- Hewlêr- Niwa Hebib Suriye- Jan Dost Fener Rojbiyanî
- Berlin- Soliman Sidou 49-30-69 00 26 95
- Badenwurttemberg- A. Rahim Ayaz 49-75453258
- Hamburg- A.Hekim Gülsün 49-40-40 33 88
- Bonn- Ahmet Baraçkılıç 49-228-66 62 49
- Amsterdam- Cotyar Zaxoy 31-20-613 07 66
- Swed- Amed Tigris 46-8-740 69 81
- Hannover- Selim Biçûk 49-5721-813 60
- Munchen- Mahmut Gergerli 49-871-670 884
- Paris- M.S. Ayçiçek 33-1-48000401
- Atina- Sirwan Reşid Bekir Bahoz 30-1-3634905

Exlaq û prensîbên wergerandinê

Destpêk rûpel 11

Alfabeya pirtûka wergerandî ne ya Celadet e. Wan bi ABC'ya tirkî nivîsandine, ku niha gotûbêj li ser wê xurt e. Hinek diparêzin, ji ber ku ji tirkî nêzik e, lêv kirina wê hêsan e, bi taybetî ji bo kesên bi tirkî dizanin bixwînin û binivîsin. Bigiranê di weşanên Komkarê de ev alfabê tê bikaranîn. Cudabûna di navbera herdu alfabeyan de jî ev e (tenê ji bo tipên dengdar): ABC'ya Celadet: î, i; kesên Celadet red dikin jî alfabeya wan wekî ya tirkî ye û (i) li şûna (î) û (î) jî li şûna (i) bi kar tînin. Nimûne: Di benda 4, rûpel 27 de Qanat kur-mancî û soranî bi hev re dinirxîne, dinivîsîne: Îzin, iş, nîr, hirî, derzî, dîtin, kirîn. Di pirtûka wergerandî de bi alfabeke nû bi zêdekirina hinek gotinan dinivîsîne: izin, ini, hiri, derzi, ditin, K'irin, birin. Di benda 6'an de jî dîsa guh nedane Qanat, li ser kêfa xwe gotina (bav) zêde nivîsandine. Di benda 9'an de (ûlax, çûn), benda 7, 8'an

hatine avêtin. Berde bendan, rûpel nehatine nivîsandin. Ji aliyekî ve rênivîs, ji aliyê din ve rêz-iman û alfabe cuda hatine nivîsandin. Weşanxaneyek bi vî awahî, bêqeyd û sînor dest biavêje nivîsê û biguhere, ez bawer nakim ku bikaribe xizmetekê ji çand, huner û literaturê kurdî re bike. Heke wisa be, dest neavêjin ji xerabkirina nivîsaran ne baştir e?! Belkî hinek dixwazin çend pirtûkan zêde bifiroşin, derdê me ne zêde firotin û derxistina pirtûkan e, derdê me yê mezîna xwendina wan pirtûkan e. Eger xwediyên wan weşanxaneyan li ser vê pirsê fikirbin baş dibe. Pirtûka neyê xwendin, ji dil neyê girtin û cihê xwe negire, wê çima mesref lê were kirin û ked di ber de were dayîn. Hêviya min carekê ev e; eger hûn dixwazin berhemeke zanyar û şarezayekî kurd, an jî biyanî wergerînin, ji kere-ma xwe re prensîb û exlaqê wergerandinê biparêzin, sînor derbas nekin. **DILBIXWÎN**

Norwec di ina aşmî (kirdkî)


Qerqelêk kewto (koto) merdoman, kuçan di herri berzî niyena war. Trafik gorê qanunanê xwi şixuliyêno. Torinê Vîkîngan binê roşnaya çilan di, kewti dayişûgirewtişî dim a. Roj, nimajînimrojî di tarî wo. Aşma zimistanî a verîni ya. La ard di zaf tay vewri esta. Vewra sipî, bi rehma xwi zerra şarê Norwecî şad kerd. Wexto ki zimistan yeno herkes behsê tariyey, wişkey û tenganey keno. Ina tenganey, tenganey ruhî ya. Mëmanê (niyemanê) demanxanan, nêweşxanan benî zafi. A dawa ra bi name bê roşney çî bibo zerra şarî di herayey virazeno. Ma kurdan hetî, aşmê zimistanî nişanê çinibiyayîş û xizaney î. Demewo ki inê aşmî qediyaynî dayikî bi çon kewtinî miyanî kileran (bananê peyenan) xizaney kerdinî teber. Inê rojan di, Norwec di amadeyika girdi esta. Her kuçe di merdom raştê merdomanê riwiyayan (rihuwiayan) yeno. Seki tariyey bina-tira (bincara) wederiyo. Norwecijan syndromî YA (Yeweya Awrupa) xwi ser ra eşto, zê mircolan (mijloran) kewtî dikanan miyan. Yewbînan rê xelatan gênî. Nizdî ra, 24î ina aşmî di Meyremi Îsay ana dîna. Noelê yîni dest keno pa. Nika ra şabi-

yayîş kewto miyanî yîni, wazenî atmosferêka weşî virazî. Lembê çirûsiyenî, daranê çaman her ca xemelnawo. Lac û keynanê Vîkîngan î küyîyan bi edetanê Homê (Hûmay) xwişê keyen (kon) Tor Kerdotyeman, her serrî 24'ê aşama zimistanî a verîni di pîroz kenî ki zorê hêzanê nerindan berî û tariyey ra bixelesî. Ina aşmî beno ki zaf xerîban rê zehmet vêro. Çimkî Noel di her ca qefeliyêno. La ma kurdî na aşmî di gelekî bi şad; mirûzî ma viraziya, wiyayîşêk aliziya rîyanê ma. Çira ma bî şadî? Ina aşmî di Leylaya ma zerra ma di bî gulî, cîhani di bî sembola cengê azadî. Herçiqas ma pê cezawardîşê parlamentaranê xwi; bideji zî, şadbiyayîşê ma dewam ekno. TV, radyo û hema rojnameyan behsê Leyla û embazanê jay kerd: "Sembola cengê azadî ya kurdan. Leyla Zana embazanê xwi reyra 15 serrî ceza wardi. Ina ceza niyena qebulkerdîş!" Ma biveynî Serekwezira Norwecî Gro Harlem Bruttland, vînikerdîşê vicînayîşê YA ra pey, derheqê birniyayîşê çekanê Norwecê ki dana Tirkiya se kenana. Meclîsa Norwecî di gelekî parlamenterê wazenî, cadî rotîşê çekan bivîni. Ma biveynî çekî birênî yan nê! **MEMO DARRÊZ**

FERHENGOK

- Armanc:** Hedef
- Aşit:** Şepe- Aşıta berfê bi ser me de hat.
- Cegermend:** Dilêr, wêrek
- Çand:** Kultur
- Çixat:** Neftik, kibrît
- Giring:** Muhîm
- Giringî:** Ehemiyet (önem)
- Hawirde:** İhracat
- Herzeng:** İskîng- (Digirî, dida herzengan, İske İska wî bû.)
- Hinarde:** İthalat
- Kelk:** Feyde- Min tu kelk jê nedît
- Koling:** Tevir (qazme) Silêman bi koling himê xênî dikole.
- Mijar:** Mewzû- (Li ser vê mijarê divê em hinekî bisekinin.)
- Nimandin:** Temsilkirin, nişandan
- Pişavtin:** Helandin, asimilekirin
- Sazî:** Dezgeh, muesese (kurum)
- Wêje:** Tore, edebiyat
- Xizan:** Feqîr

Ehmedê Xanî di 1061'an de hatiye dinê. 1061 bi salnameya hicrî ye. Ev jî li gorî salnameya mîladî 1651 e. Yanê li gundê Xanî ku li ser Culemêrgê ye, hatiye dinê û li Bazidê diçe rihmetê (Mêjûya mirina wî tam nayê zanîn). Şair û filozofê mezin jî biçûkatiya xwe ve dest bi nivîsandinê dike. Dema berhema xwe ya binavûdeng Mem û Zîn diqedîne 44 salî ye. Ji xeynî Mem û Zîn du pirtûkên wî yên din gihîştine îro. Ev jî Nûbihara Biçûkan û Eqîda Îmanê ne. Tirba Ehmedê Xanî hê jî li rû Sereya Îshak Paşa, li Bazidê ye.



Ez mame di hikmeta xwe
Kurmanê di dewleta xwe
Aya bi çi wechî mane mebrûn
El cume ji ba çi bîwe mebrûn

Ev jî Nûbihara Biçûkan
Eqîda Îmanê ne

Tirba Ehmedê Xanî
hê jî li rû Sereya Îshak Paşa

li Bazidê ye

Artist: A. gâlbazî

Artist: A. gâlbazî

Artist: A. gâlbazî

Artist: A. gâlbazî

Artist: A. gâlbazî

Artist: A. gâlbazî

Artist: A. gâlbazî

Artist: A. gâlbazî

Artist: A. gâlbazî

Artist: A. gâlbazî

Artist: A. gâlbazî

Artist: A. gâlbazî

Artist: A. gâlbazî

Artist: A. gâlbazî

Artist: A. gâlbazî

EHMEDÊ XANÎ